CIVAKNASÎ

AMADEYÎ 1

2019/2020

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Civaknasiyê ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê

- Komîteya Fotoşopê

- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

BEŞA YEKEM..7

CIVAKNASÎ ÇI YE? 7

CIVAKNASÎ ÇI YE? 8
ARMANC Û MIJARÊN CIVAKNASIYÊ.......................................11
CIVAK Û PÊKHATEYÊN CIVAKÎ 1..17
CIVAK Û PÊKHATEYÊN CIVAKÎ 2..20
CIVAK Û PÊKHATEYÊN CIVAKÎ 3..23
CIVAK Û PÊKHATEYÊN CIVAKÎ 4..26
GIRSEYÊN CIVAKÎ 30
BEŞÊN CIVAKÎ 32

BEŞA DUYEM...35

DÎROKA CIVAKNASIYÊ 35

IBIN XELDÛN..36
COMTE - HARRIET..39
MARKS – DURKHEIM – VEBER..43
CIVAKNASIYA POZÎTÎVÎSTÎ 47
CIVAKNASIYA AZADIYÊ...50

BEŞA SÊYEM 55

CIVAKNASÎ Û ZANISTÊN DIN 55

CIVAKNASÎ Û DÎROK..56
CIVAKNASÎ Û RAMYARÎ..60
CIVAKNASÎ Û ABORÎ 64
CIVAKNASÎ Û DERÛNNASÎ..68

BEŞA ÇAREM...73

ÇAND Û CIVAK..73

ÇAND ÇI YE? 74
CIVAKA SINCÎ Û RAMYARÎ 78
BANDORÊN ÇANDÊ YÊN LI SER ÇÊBÛNA CIVAKÎ Û KESAYETÊ.............81
ÇANDA KURDEWARIYÊ 86

BEŞA YEKEM

CIVAKNASÎ ÇI YE?

- Civaknasî çi ye?
- Armanc û mijarên civaknasiyê.
- Civak û pêkhateyên civakî. 1- Klan, malbat.
- Civak û pêkhateyên civakî. 2- Êl, hoz.
- Civak û pêkhateyên civakî. 3- Milet û netew.
- Civak û pêkhateyên civakî. 4- Avabûna şênberî.
- Girseyên civakî.
- Beşên civakî.

Wane 1

Civaknasî çi ye?

Pir kes di warê jiyan û xwezaya civaka xwe de xebitîne. Ev kes weke civaknas, fîlozof û pêxember li wan hatiye nêrîn.

Têgeha civaknasiyê, cara yekem ji aliyê civaknasê Fransiz **Comte Comte (**Ogost Kant) ve, hatiye bikaranîn. Lê belê, em dizanin ku civaknasî her çi qas ji dema **Comte Comte** ve weke têgeh hatibe bikaranîn jî, lê beriya pêvajoya wî jî, weke zanist li ser hatiye xebitandin, ew jî ji ber ku civak ji beriya hezarên salan ve heta niha berdewam e. Cihê ku civak lê hebe, li wir bi pirsgirêkên civakê re, mijûlbûn jî heye. Em dikarin bibêjin ku di sedsala 18'an de, cara yekem weke têgeh hatiye bikaranîn, lê em nikarin bibêjin ku civaknasî di sedsala 18'an de derketiye.

Civaknasî, zanista xwezaya civakê ye, ji têkiliyên xwezaya yekem (xweza bixwe) bi xwezaya duyem (civak) re, pêk tê. Bi giştî, hemû qonaxên ku mirovahî tê re derbas bûye û heta roja me ya îro, dike mijara lêkolînên xwe.



Ji zanista ku bi avabûn, guherîn û pêşketina civakê re mijûl dibe, **civaknasî** tê gotin. Di heman demê de civaknasî, li gorî taybetiyên çand, cih û demê, jiyana kom û nêzîkatiyên mirovan ên di civakê de, bi awayekî zanistî lêkolîn dike.
Mirov dikare pênaseyan zêdetir bike, lê heger weke cewher di asta giştî de, civaknasî bê pênasekirin, gerek e em van pirsan bikin:

- Xwezaya civakî, çi ye?

- Taybetiyên wê çi ne?

Civaknasî bi taybetî van mijaran bi zanistî lêkolîn dike. Piranî xwezaya girseyên mirovan û taybetiyên nêzîkatiyên wan ên civakî, lêkolîn dike. Hewl dide wan pênase bike û rastiya wan diyar bike. Civaknasî, weke zanisteke ku li ser vê armancê tev digere, tê pejirandin. Civaknasiya navendî ya Ewrûpayê ev zanist parçe parçe kiriye û ji rewşa mijûlbûna bi jiyan û xwezaya civakbûyînê re, dûrbûneke pir mezin çêkiriye.

Taybetiyên civaknasiyê:

1- Civaknasî, bi pirsgirêkên mirovan re yek bi yek têkildar nabe, pirsgirêkên ku di encama têkiliyên civakî de rû didin, digire dest.

2- Civaknasî, zagonên gerdûnî yên ku civakan bi rê ve dibin, pênase dike.

3- Civaknasî, zanisteke xwezayî ye, ne zanisteke serboriyî (cerbandin) ye, ji ber ku derdor û bûyerên civakî her tim di nava guhertinê de ne. Her wiha çavdêrkirin di mercên ezmûngehan de, ne gengaz e. Ji ber vê yekê jî, li şûna rêbaza serborî, rêbazên teknîkî û taybet, bi kar tîne.

4- Civaknasî, sedemên diyardeyên civakî, di heman diyardeyê de digire dest.

5- Civaknasî, sazîbûna civakê bi awayekî yekgirtî digire dest û têkiliyên navbera hêmanên ku vê yekgirtiyê ava dikin, lêkolîn dike.

6- Civaknasî, bi hemû zanistan re têkildar e.

Pirsên Nirxandinê

1- Civaknasiyê pênase bike?

2- Erkên civaknasiyê bi hevalên xwe re, parve bike.

3- Lîkolînekê li ser navên du civaknasan bike.

Wane 2

Armanc û Mijarên Civaknasiyê

Armanca civaknasiyê:

Armanca civaknasiyê, naskirin û têgihaştina civakê ye. Di vê mijarê de, pêwîst e em bi du awayên hizirînê, şîroveya armancên sereke yên civaknasiyê bikin.

Yekem: Li gorî şêwazên pozîtîfîzmê ya ku bingehê xwe ji civaknasiya Ewrûpayê digire, **Civaknasiya Pozîtîfîst** ango civaknasiya Comte Comte tê gotin.

Duyem: Civaknasiya ku bingehê xwe ji civaka xwezayî digire û li gorî Abdullah Ocalan **civaknasiya azadiyê**, jê re tê gotin.

Li ser vî bingehî taybetiyên bingehîn ên civaknasiya pozîtîfîst, ev in:

1- Civakê ji aliyê cih û demê ve, ji raboriya wê qut dike û di nava mercên şênber û razber ên dema tê de, dide nasîn.

2- Civaka Ewrûpayî weke mînak û bingeh tê girtin. Her wiha taybetiyên vê civakê li ser tevahî civakan tê sepandin, tevî ku ne ji taybetiyên civakan e.

3- Civakê, weke hebûneke fîzîkî digire dest û li gorî zagonên zanista fîzîk, kîmya û zindînasiyê nêzîk dibe.

Li gorî angaşta vê zanistê, civak her ku çûye, bi pêş ketiye. Bi van taybetiyan, civaknasiya pozîtîfîst a ku li Ewrûpayê li pêş ketiye, bûye zanista desthilatdariyê, di destê desthilatdar û sermayedaran de ye. Vê yekê rê li ber bêhişbûneke pir mezin a pergalê vekiriye.

Pirsgirêkên şer, pevçûn û nakokiyên ku di dema nûjentiya kapîtalîst de bi pêş ketine, ji çarekirina wan zêdetir, nakokî kûrtir kiriye. Ji ber vê yekê ev zanist ji gumanên ku hatine jiyîn, berpirsiyar e. Pêşketina civaknasiyê, weke pêwîstiyeke civakî derketibû holê.

Di vê mijarê de civaknasiya ewrûpayî, di bin bandora pergala nûjeniya kapîtalîst de ye.

Ev civaknasî, her çi qas di warê teorî de ji bo civakê şîrove û pênaseyan tîne jî, lê civak di rajeya (xizmet) desthilatdaran de dimîne.
Ev civaknasî, ji dibistanên seretayî heta zanîngehan, bi perwerdeyên fermî li ser kesan tê sepandin. Di bin bandora dewlet û çînîtiyê de di rêya van perwerdeyan re, mirovên ku li hemberî derdor û civaka xwe biyanî bûne, tên avakirin û çanda dûrbûna ji civakê tê pîrozkirin.

Ji bo ku mirov û civak, ji nû ve rastiya xwe ya dîrokî nas bikin, dê bi azadkirina kêliyê re derbasî pêşerojê bibin. Pêwîst e di destpêkê de nêzîkatiya nimûneyeke nû ya huner û zanistê di nava şoreşa hişmendiyê de, bê jiyankirin. Pêwîst e Şêweyên nû yên dibistan û akademiyên zanistên civakî, di asteke xurt de û li gor pêdiviyan bên sazkirin**.**

Di roja me ya îro de, zanista herî zêde pêwîst dike ku xwe ji dewlet û desthilatdariyê rizgar bike**, civaknasî ye**, ji ber ku ev zanist, ne li ser xeta wekhevî û azadiyê ye. Pêwîst e li ser bingehê azadiya civakî, ji nû ve xwe bide avakirin.

Mijarên civaknasiyê:

Mijarên ku zanista civakî lê dikole ne kes e, lê belê civak û heyînên civakî ne. Kesan yek bi yek lêkolîn nake, dema ku lêkolîn bike jî, wê demê nagihêje tu encamê. Her çi qas hêmana lêgerînê di wateyeke berfireh de bê pênasekirin jî, dîsan mijarên lêkolînan, mirov û heyînên civakî ne.

Mirovên civakî, tên çi wateyê? Mirovên ku xwedîtêkiliyên civakî ne û hemû dîroka civakbûyînê digirin nava xwe, **"mirovên civakî"** ji wan re tê gotin.

Mijarên sereke yên ku civaknasî bi wan ve mijûl dibe, ev in:

Komên civakî, girseyên civakî, beşên civakî, bûyerên civakî, diyardeyên civakî, têkiliyên civakî û avabûnên civakî.

Li ser vî bingehî, qada lêgerîna civaknasiyê, weke komên mirov û nêzîkatiyên civakî dibe sê beş:

1- Komên civakî:

Ji bo çêbûna komeke civakî, pêwîst e herî kêm du kes bikevin nava têkiliyan. Di heman demê de, ev têkilî di demeke diyar de û li ser bingehê armancên hevpar tê danîn û jiyankirin.

Dema ku em li ser komên civakî diaxivin, bi vî awayî em heyîneke civakî pênase dikin. Her wiha di nava her komê de, erk û berpirsyarî jî hene.

Komên Civakî: Bi piranî mirov, komên mirovan, xweza û têkiliyên wan digire nava xwe. Mirovnasî û derûnnasî hem bi hem heyînên din jî lêkolîn dikin, lê belê civaknasî tenê mirov û bûyerên civakî yên ku bi jiyana wan re têkildar in, lêkolîn dike.

2- Nêzîkatiyên civakî:

Mijarên weke: Tiştên ku mirov dikin, mirov çawa bandorê li derdora xwe dikin, dabeşbûna kombûna wan û li hemberî tevgeran dê bertekên çawa nîşan bidin, hizirên ku çêdibin, digire nava xwe.

Nêzîkatiyên civakî: Kom çawa tev digerin, çawa hev û du bandor dikin û çawa ji nêzîkatiyên kesan bandor dibin, diyar dike. Bi kurtasî, di nava cih û demê de, çêbûna komên mirovan, guherîn û pêşketinên sazîbûnên civakî, kevneşopiyên heyî, têkilî û ji hev bandorbûna komên mirovan, hemû avabûn û taybetiyên ku di vê çawaniyê de ne, di qada baldariya civaknasiyê de cih digirin.

3- Têkiliyên civakî:

Mirov di nava jîngeheke şênber û razber de, cih digire. Di heman demê de, di jiyana xwe ya rojane de, di nava hin sazî û

koman de, kar û xebatan dimeşîne. Dema ku em di çarçoveyeke herî teng de lê binêrin, ji danûstandinên mirov bi mirov, mirov bi kom an jî kom bi koman re, "**têkiliya civakî**" tê gotin.

Mînak: Dema ku kesek li kolanê dimeşe, silava ku dide yan jî distîne, her çi qas têkiliyeke demkurt be jî, mirov nikare bibêje ev têkilî tenê têkiliya di navbera du kesan de ye. Ev nirxê civakî, kevneşopiya civakê ya dîrokî ye.

Têkiliyên civakî dibin du beş:

1- Bingehên têkiliyên civakî:

Em her gav li mal, dibistan, bazar, di nava xwezayê de û li her deverê, bi kes û komên cur bi cur re û li gorî karên ku em pê radibin, têkiliyan datînin. Têkiliya kes bi kes, kes bi kom, an jî kom bi koman re bingehê têkiliyên civakî pêk tîne.

2- Cureyên têkiliyên civakî:

Di lêkolîna têkiliyên civakî de, pîvanên cuda hatine bikaranîn. Di hin lêkolînan de, hejmara kesan û dema têkiliyan li ber çavan hatine derbaskirin. Ji ber vê yekê, di rêzkirina awayên têkiliyan de, encamên cuda hatine bidestxistin.

Ev encam wiha ne:

• Awayên têkiliyên civakî li gorî hejmara şêniyan:

Ev şêwe têkiliyên civakî û têkiliyên mirov bi mirovan re, li gorî hejmara kesan digire dest û dibe du beş:

a- Têkiliya kes bi kesan re:

Di danûstendina rojane de weke ya xwendekar û mamoste, dayîk û zarokên xwe û axaftina ku di navbera heval û hogiran de çê dibe... têkiliyên rû bi rû ne.

b- Têkiliya kom bi kesan re:

Mirovê ku di komeke dîlanê de be, yan jî di tîmeke fûtbolê de endam be, bi qasî ku mirov li hemberî tîm an koma xwe berpirsyar be, ew qasî tîm an kom jî li hemberî wî berpirsyar e. Ev têkilî di navbera kom û kesan de ye.

Li gorî demê:

A- Têkiliyên demkurt:

Sazkirina şahiyekê ji aliyê çend kesan ve, ji têkiliyên demkurt re mînak e.

B- Têkiliyên demdirêj:

Têkiliyên malbatî, cîrantî, yan jî yên hevaltiyê, têkiliyên demdirêj û domdar in.

C- Têkiliyên rêxistinî:

Ev peywendî di demên diyar de pêk tên. Mînaka wê civînên mehane yên encumenekê yan jî rêxistinekê… ne.

Pirsên Nirxandinê:

1- Li gorî civaka we, armanca civaknasiyê divê çi be?

2- Girîngiya civaknasiyê ji bo jiyana me, çi ye?

3- Mijarên civaknasiyê çi ne? Şîrove bike.

4- Têkiliyên civakî bi hevalên xwe re guftûgo bike.

Wane 3

Civak û Pêkhateyên Civakî 1

Klan û Malbat

Klan: Tovik û xala destpêkê ya ku mirov pê civakbûn dest pê kiriye, klan e. Di klanê de desthilatdarî, çînîtî û dagirkerî tune bû. Bi milyonên salan mirov jiyana xwe bi rengê klanê berdewam kiriye. Em dikarin li ser jiyana mirov a bi rengê klan wiha bibêjin: Mirov weke klan, demeke dûvdirêj di nava xwezayê de jiyaye û girêdaneke baş ya wî bi xwezayê re çêbûye.

Klan, ne bi awayekî deshilatdarî, lê bi awayekî xwezayî berdewam kiriye. Her wiha, xweza ji xwe re weke dayîk û çavkaniya hemû jêderên jiyanê, dîtiye. Taybetiyeke din a klanê jî ew e ku hemû serwerî û rêxistina wê, di bin birêveberiya dayîkê de, hatiye birêvebirin.

Arkolojê Amerîkayî Liwis Morgan (Liwîs Morgan), vê xalê di nîvîsên xwe de eşkere dike û dibêje: **"Civakên kevin ên ku di bin birêveberiya dayîkê de mane, temenekî pir mezin jiyane."**

Mirov dikare bibêje ku di klanê de, hevsengî di navbera mirov û xwezayê de hebû, ku bi vê hevsengiyê bawerî, çand, sinc û têkiliyeke birêkûpêk, li pêş ketibû.

Bêguman, diyardeyên xwezayî bandoreke pir mezin li ser avabûna klanê dikir; hetanî hejmara endamên klanê jî sînordar dikir. Hejmara endamên klanê, di navbera 20-50 kesî de bû. Her endam, ji aliyê hevsengiya civakî ve, xwedî erk û li beranberî klanê xwedî berpirsiyarî bû.

Tu endamê klanê, nikarîbû bi tena serê xwe bijiya. Dema ku endamek ji klanê qut dibû, dihat wateya ku ew endam ji jiyanê qut bûye. Tu endamên klanê, nikare bêyî klana xwe bijî û hemû endamên klanê neçar in ku pîvanên klanê pêk bînin. Hişmendiya klanê ev bû: **"Em hemû ji bo kesekî ne û her kes jî ji bo klanê ye".**

Dema ku endameke/î klanê zagonên wê pêk neyîne, tê cezakirin û demekê ji klanê tê dûrxistin. Ev weke zagonên xwezayî tên pejirandin.

Weke pîvaneke civakî, her klan xwedîsembol e, ku di heman demê de ew sembol baweriya wê diyar dike.

Mirov dikare bibêje, totem sazûmaniya baweriyê ya destpêkê ye. Totem, têgeha perestina destpêkê ye ya ku "**tabû**" jê re tê gotin. Tabû, tê wateya qedexekirina destdayîna heyînên ku di nava klanê de pîroz tên dîtin.

Malbat:

Têgeha malbatê, li gorî pêkhatina xwe, wateyên cuda bidest xistiye. Malbata ku ji dayîk, bav û zarokên wan ên negihaştî (ne zewicî) pêk tê, "**malbata tovik**" ji wan re tê gotin. Ji malbata ku ji bapîr, dapîr, zarok û neviyên wan ku malbateke berfi-rehtir pêk tînin, "**malbata mezin**" an jî "**malbata berfi-reh**" ji wan re tê gotin.



Bi pênaseyeke giştî, di encama şûkirinê (zewac) de girêdana xwînê di navbera kesan de pêk tê. Ew girêdan xwedîpeywendiyeke civakî ye û li ser bingehê têkilî û sazûmaniyeke çandî û sincî ya hevpar tê avakirin. Malbat, erkeke civakî hildigire xwe. Di malbatê de

jiyana hevpar, piştgirî, berpirsiyarî, xwedîlihevderketin û xweparastin, taybetiyên bingehîn in.
Di nava xwe de, bi rêya perwerdekirina zarokan, nirxên civakî di endamên civakê de diçîne û dide pêş.

Her çi qas klan weke malbat neyên pejirandin jî, lê klan koma civakî ya destpêkê ye. Cudahiya klanê ji malbatê ew e ku klan şêweyê deshilatdariyê hilnagire û bi awayekî xwezayî ye. Piştî şoreşa gund û çandiniyê, di salên **3000'î B.Z** de demeke dirêj weke malbat bi birêveberiya dayîkê hebûna xwe diparêze.

Lê piştre derbasî serdema baviksalariyê dibe; birêveberî û serweriya malbatê jî dikeve bin destê zilam. Serdestiya li ser jinê bû bingehê ramana maldariya zilam û jin hat kolekirin. Çavkaniyên herî girîng ên karê malbatê, li ser jinê hat sepandin û bi vî awayî karê malbatê li ser kesayeta jinê hat barkirin. Malbata îro, ketiye rewşa pergala desthilatdariyê û neçarî jiyana bindestiyê bûye. Malbat, ji rastiya xwe hatiye qutkirin, lê belê divê careke din li rastiya xwe vegere.

Baş e**,** ev rewş dê çawa bê derbaskirin? Hişmendiya kapîtalîst a ku li ser jin û zarokan hatiye sepandin, pêwîst e bê rakirin. Her wiha têkilî û peywendiyên navxweyî (têkiliyên dayîk û bav ên bi zarokan re) ji nû ve werin destgirtin.

Malbata ku di vê çarçoveyê de xwe veguherîne, dê bibe bingehê herî baş ê civaka demokratîk.

Pirsên Nirxandinê:

1- Klanê pênase bike. Çawa klanê xweza bingeh girtiye?
2- Çima endamekî klanê, nikarîbû bi tena serê xwe bijî?
3- Çi cudahî di navbera malbata tovik û malbata berfireh de heye?
4- Çawa em dikarin malbata îro, veguherînin malbateke demokratîk?

Wane 4

Civak û Pêkhateyên Civakî 2

Hoz û Êl

1- Hoz:

Hoz, yekîtiya kilanan ne; çend klan û malbat li ser bingehê alîkarî, çandinî û xweparastinê tên cem hev û hozekê ava dikin. Di hozê de, ji girêdana xwînî zêdetir, têkiliyên hevbeş hene. Hoz, xwedîçand û zimanekî hevbeş e û xwedîtaybetiyên civakî ye. Hoz, yek ji hêmanên herî girîng ên civakê ye ku yekîtiya malbatan ava dike. Bi piranî hoz li gund û herêmên ku çandinî lê hene, dijîn.

Dema ku malbat di çarekirina pirsgirêkên hilberîn û ewlekariyê de ni-karibe pêdiviyên xwe bi dest bixe, hoz ji ber ku xwedîjiyaneke komînal e, van pirsgirêkan çare dike. Her wiha, hoz jî bi awayê xwe yê koçerî, her tim di rêzên pêş de weke hêzên resen, bûne avakerên dîrokê. Di dîrokê de li şûna şerê çînîtî, di şerê hozên nêzî hev de her tim şerên mezin rû dane. Ev rastî, di dîroka şaristaniyan de jî, bi awayekî pir zelal derdikeve holê. Ev rewş, bûye sedema hebûna rastiya mirovê îro, yê ku hebûna xwe parastiye.

Beriya ku şaristanî bi pêş bikeve, hoz xwedîjiyaneke azad û xwezayî bû. Sincê hozê pir serwer bûn; kes ji bo hoza xwe, hoz jî ji bo kesê xwe, dikarin cangoriyê bikin.

Dema ku şaristanî nêzî hozê bû û xwest wê bindest bike, pêvajoya şerên mezin û berfireh dest pê kir. Ji nakokiyên dîrokî, yek jê ew e ku dewlet dixwaze hozan kole bike. Li dijî wê berxwedana hozê derdikeve holê; çol û çiya, bûn wargehên berxwedan û parastinê.

Divê mirov baş zanibe ku rûyê herî hov ê dîrokê, di kolekirina hozan de hatiye dîtin. Hoz, dibin êl û bi vî awayî berxwedana xwe mezin dikin û dixwazin ji vê pirsgirêkê rizgar bibin

2- ÊL:

Malbat û hozên berfireh ku xwedîheman kokên ziman, çand û parvekirina hilberînan e, ji wan re **"êl"** tê gotin. Piraniya êlan, li gund û herêmên çandinî û lawirvaniyê belav dibin. Dîroka çêbûna êlan, vedigere demeke dirêj. Di êlan de, yekîtiya hozan pir xurt e, ev jî dibe sedema sereke ya hêzbûn û berfirehbûna êlan. Van êlan demeke dirêj karîbûn hebûna xwe li hemberî êrîşên derveyî, biparêzin.

Êlan bi yekîtiya xwe dikarî li dijî şaristaniya koledar, bi berxwedanê, xwe biparêzin.
Demeke dirêj hebûna xwe ya çandî, bi yekîtî û rêxistina xwe, şêweyê civakîbûnê veguherandin pêkhateyeke ramyarî.
Ger pêkhateya ramyarî, xweber be jî, dibe hêza sereke ya parastinê.

Yekîtiya hişmendî, dibe pêkhateyeke hevpar a civakî. Di heman demê de, bi hevkariya civakî re, bingehê hilberînê derdikeve holê. Çanda hevkarî û komînaliyê di komcivakên êlan de bihêz e. Di vir de rastiyek derdikeve holê; heger berxwedana êlan a li hemberî şaristaniya koledar nebûya, dê nikarîbûya ji bo azadiyê, jiyaneke hevpar û kevneşopiya demokratîk, serweriyekê bi dest bixe û mirovahî dê nikarîbûya xwe ji metirsiya paşverûtiyê rizgar bikira.

Taybetiyên bingehîn ên êlan:

1. Êl, yekîtiya hozan e.
2. Her êl, li gorî avabûna xwe xwedîkevneşopî ye.
3. Êl, demeke dirêj ji guhartina derveyî xwe vedigire.
4. Di êlan de yekîtiya hilberînê xurt e.
5. Piraniya êlan, li gund û herêmên çandiniyê dijîn.
6. Jiyan û rêxistina xwe, li derveyî dewletê ava kirine.
7. Êl, ji ber ku demeke dirêj taybetiyên xwe yên xwezayî parastine, li hemberî xerakirina civakê rawestiyane.

Pirsên Nirxandinê

1- Hoz çi ne û li ser çi bingehî ava bûne?

2- Piraniya êlan li ku derê dijîn?

3- Sedemên sereke yên hêzbûn û berfirehbûna êlan, diyar bike.

4- Taybetiyên bingehîn ên êlan binivîse.

5- Hoz û êlên derdora xwe, lêkolîn bike.

Wane 5

Civak û Pêkhateyên Civakî 3

Gel û Netew

Yekparebûna civakî ya ku xwedînijad, ziman, çand, welat, dîrok û berjewendî ye û xwezayeke cur bi cur di nava xwe de diparêze, jê re **"Gel"** tê gotin. Ev pênase, pênaseya civaknasiya Ewrûpayê ye.

Têgeha netewê: Ew şêweyê civakê ye ku klan, hoz û êlên ku piştî gel an jî miletan tên, dihundirîne (dihewîne). Herî zêde li ser wekheviya ziman û çandê ava dibe. Ji ber vê yekê, civakên netewî li gorî civakên hoz û miletan, berfirehtir in û gelek cureyan digirin nava xwe. Netew ji komên mirovan ên ku bi têkiliyan bi hev ve girêdayî ne, pêk tê.

Netew, diyardeyeke serdema me ye. Eger mirov wê bi awayekî giştî bide naskirin, mirov dikare bibêje**: "Koma kesên ku xwedîhişmendiyeke hevpar in".**

Şêweyê civakên şaristaniya demokratîk weke gel, netew û jiyana wan, ji ya şaristaniya fermî cuda ye.

Şaristaniyên fermî; gel û netewan weke girêdana xanedan û koma etnîk (gel-milet) a serwer têgeh kirine. Ji ber vê yekê, gel û netewan weke deyndarên xanedan û koma etnîk a fermî diyar dike.

Civaka xwezayî di nava dîrokeke sexte de, tê nixumandin û windakirin. Bi lehengkirina kesên ji nava xanedan û koma etnîk a serwer, tên derxistin û weke bavê gel û netewan tên nîşandan. Piştî ku weke lehengan hatin dîtin, mîna xwedanan tên sepandin.

Lê belê, rastî cuda ye; xwezaya civakî ku bi awayê hoz û êlan li pêş dikeve, her ku diçe zêdetir niştecih dibe, ziman û çanda xwe bi pêş dixe. Her wiha nasnameya civaka sincî û ramyarî di naveroka xwe de dest pê dike û didome, da ku weke gel û netew şêwe bigire.

Civak ji destpêkê ve, di nasnameya gel û netewan de çênabin, lê piranî di dema navîn (sedsalên 12-16) de nêzî nasnameya gel dibin û di dema nû de jî, nêzî netewê bûne.

Gel weke cure, taybetiyeke netewî ye. Tê dîtin ku di dema nû de bi du rêyan dibin netew.

1. Netewbûyîna Rêya Yekem (Pişaftin):

Tê dîtin ku di şaristaniya fermî de, bawerhişkiya gel vediguherîne neteweperestiya nûjen. Bi vî awayî, hewl dide ku awayê nû yê dewletê, weke netewa dewletê diyar bike. Hoz, êl, gel û netew, ku nasnameyên wan pir cuda ne, bi zorê li ser wan tê sepandin ku di nava ziman û çanda vê koma etnîkî de, bên pişaftin.

Ji ber vê yekê, ev rêbaza netewkirina hovane ye û komkujiya herî mezin a çandî di dîrokê de ye.

Şaristaniya fermî vê rêbaza xwe, li ser hemû çand û netewên ku bi hezaran hoz, êl û gelan dihundirîne, dimeşîne.

Ji ber ku şerên herî mezin, li ser neteweperestiyê hatine kirin, mirov dikare aliyê netewî yê neteweperestiyê bi awayê faşîzmê (netewperestî) jî bi nav bike.

Di dîrokê de mînakên netewperestiyê yên mîna: Naziyên elman, netewperestiya Tirkiyeyê û pergala Baasê yên ku li ser hîmên netewperestiyê ava bûne, mirov qir dikirin.

2. Netewbûna Rêya Duyem (Netewa Demokratîk):

Li ser bingehê ramyariya demokratîk, ji bo pêkanîna civaka demokratîk, qada civaka sincî û ramyarî bi rêya veguherandina komên wekhev, an jî ji ziman û çandên cuda, ava bûye.

Li ser vî bingehî hoz, êl, gel û heta malbat jî, di netewbûnê de weke civakeke sincî û ramyarî cih digirin û dewlemendiyên xwe yên ziman û çandê vediguhêzin netewa nû. Di netewa nû de, cihê komeke etnîk, ayîn (mezheb) û baweriyên ku muhra bîrdozeya xwe li serweriyê bide, tune ye.

Her wiha, senteza herî dewlemend ew e ku bi awayê dilxwazî pêk were. Gelek komên cuda yên ziman û çandê jî, dikarin weke civakên demokratîk bi ramyariya demokratîk re, di nasnameya netewan de, bijîn. Ev jî rêya guncaw a xwezaya civakî ye.

Pirsên Nirxandinê:

1- Gel û netewê pênase bike.

2- Çima netew hebûneke hişmendî ye?

3- Şaristaniyên fermî, çi têgehê ji bo gel û netewan bi kar tînin?

4- Divê xwezaya civakî ya gel û netewan çawa şêwe bigire?

Wane 6

Civak û Pêkhateyên Civakî 4

Çêbûna Civakî ya Fîzîkî

1. Gund:

Gund: Şêwaza jiyana cihwarbûna yekem e. Ji komên mirovan ên ku hejmara wan biçûk û li ser qadeke sînorkirî, xwedîtaybetiyeke kar û parvekirinê ya çandinî û lawirvaniyê ne û ji aliyê civakî ve jî xwedîtêkilî ne.

Gundê Gotiyan (Amûdê)

Gund, di bingehê xwe de, çandeke jiyanî û hilberînê ye. Komên mirovan, destpêkê bi xakê ve hatine girêdan, li deverên ku ji bo jiyanê, bi taybetî li perav û cihên ji bo çandinî û lawirvaniyê destdayî bûn, bi cih dibûn. Li herêmên çiyayî jî, ji ber mercên erdnîgariyê, hejmara mirovan kêm dibû û ji bo jiyaneke destdayî, xwe didan herêmên deştî.

Di lêkolinên zaniyaran de hatiye çespandin ku herêma Çemê Xalanê yê nêzîkî Êlihê, gundê Xerabreşkê yê nêzîkî Rihayê, Çemê Koteberê yê Erxeniyê, Newala Çoriyê ya nêzîkî Siwêrekê û hwd, ji gundên destpêkê re bûn cih û war.

Hîn jî li vê herêmê (Mezopotamyaya Jorîn) bi sedan mînakên bi vî awayî yên ku ji aliyê mirovnasî û şûnwarnasiyê ve nehatine lêkolînkirin û derneketine holê, hene. Di salên (11.000-9000 B.Z**)** de hatiye dîtin ku mirovan dest bi jiyana niştecihbûnê kirine. Di qadên civakî yên gundan de, têkilî û peywendî li ser hîmên xizmatî û nirxên kevneşopî yên xwezayî ava dibin. Hevbeşkirina civakî ya xwezayî jî, li herêmên gundan bihêz e, xwedîtaybetiyeke çandî ye û hemû rêkûpêkiya civakî jî, li ser

kevneşopiya civakî û sincî bi rê ve diçe. Her wiha pirsgirêkên civakî yên gundan, ne bi rêya zagon û destûrên fermî çare dibûn. Civaka gundîtî, weke yekem diyardeya niştecihbûnê, girîng e.

2. Bajar:



Dema ku em li ser avabûna bajaran biaxivin, pêwîst e em li dîrokê vegerin. Pêkhateya bajar, xwe dispêre demeke pir dirêj ku bi pêşketina pîşesaziyê re, bûye navendeke girîng a cihwarbûna mirovan. Ew jî li Mezopotamyayê xwe dispêre raboriyeke bi qasî **5500** salî. Derdora Çemên Dîcle û Feratê, li Misrê derdora Çemê Nîlê û li Çînê derdora Çemê Zer, bajarên dîrokî hatine avakirin.

Bajarbûn, di sala 3500'î B.Z de, li Mezopotamyaya Jêr dest pê kiriye. Di heman demê de, mirov dikare bibêje, bajarbûn di navbera salên (6000-4000 B.Z) de bi çanda Elubeyd re, derketiye holê. Bajarên destpêkê: Erîdû, Ûrûk û Ûr in. Di heman demê de, ev bajar dibin navenda gelek şaristaniyên weke: Sumer, Akad, Babil û Asûran ku di wê demê de bûne navenda çûn û hatina bazirganî û desthilatdariyê.

Li gorî jêderên dîrokî, bajarên destpêkê bi zorê hatine avakirin. Ev rastî di Destana Gilgamişê de, hatiye neqşandin. Ev bajar bûne navendên danûstandina mirovan û cihên pêşketina hilberînan. Di salên (6000 û 4000 B.Z) de li herêma Mezopotamyaya Jêrîn û Misirê hatine avakirin. Bajarê destpêkê yê ku hat avakirin, nêzî 37000 kes tê de niştecih bûne.

Bi taybetî, li herêmên ber deryayan, danûstandina bazirganî, çûn û hatina mirovan li pêş ketiye; da ku karibin hevsengî û têkiliyeke civakî jî li pêş bixin.

Ji ber mercên erdnîgarî û çandî, bajarbûna li herêmên Rojhilata Navînê ji ya herêmên Ewrûpayê cuda ye. Li herêmên Rojhilata Navînê, bajarbûn bi taybetî li Mezopotamyaya Jêrîn û li Misirê, bi giranî li ser xwezayê û jêderên xwezayî bi pêş ketiye. Lê li Ewrûpayê, ji ber ku deverên çandiniyê kêm in, bi derxistina kanzayan ve mijûl bûne û bi derxistina kanzayan re amûrên cuda cuda hilberandine. Jixwe yên ku herî zêde bandor li ser çêbûna bajarbûnê kirine, derya û bazirganî ne.

Mînak: Sedema herî girîng a pêşketina bajarê Atînaya Yewnanistanê, ew e ku Atîna navenda di navbera Rojhilata Navîn û Ewrûpayê de bû. Di heman demê de, ji ber nêzîkbûna wê ji deryayê, bû navenda bazirganî, danûstandina peywendiyên civakî û hilberînên berhemên cuda cuda û ji aliyê hiş ve jî guhertin çêkiriye.

Pirsên Nirxandinê:

1- Gund pênase bike û çend taybetiyên gundan diyar bike.

2- Çend gundên destpêkê ku bûne cih û war, binivîse.

3- Peywendiyên civakî yên di navçeyan de çawa ne?

4- Birêveberiya dewletê ya li navçe û bajaran, ji aliyê kê ve pêk dihat?

5- Di dîrokê de bajar kengî û bi piranî li ku derê hatine avakirin?

6- Çend bajarên destpêkê yên di dîrokê de binivîse û girîngiya wan diyar bike.

Wane 7

Girseyên Civakî

Girseyên civakî: Ew kesên ku bi hizirên hevpar tev digerin û di hundirê xwe de heman coş û kelecanê hildigirin, lê ne bi sazûman û herdemî ne. Di navbera van kesan de têkiliyeke rasterast tune ye.

Taybetiyên girseyên civakî, ev in:

1. Kesên ku girseyê ava dikin, gelêrî û ji hev biyanî ne.
2. Di nava girseyê de, têkiliyên civakî yên rasterast, ne merc in.
3. Di nava girseyê de, zagonên ku tengkirinekê di nêzîkatiyên wan de çêbikin, tune ne yan jî pir kêm in
4. Girse, ne herdemî ne.

Girseyên civakî, di nava xwe de dibin sê beş:

1- **Girseyên Qerebalix:** (Ne rêxistinkirî ne)

Ew mirovên ku xweber hatine gel hev; ji aliyê fîzîkî ve nêzîkî hev in, lê ji aliyê hizirî ve bi hev re ne têkildar in û ne sazûmankirî ne.

Mînak: Girseyên ku di bazarê de tiştan dikirin an jî difiroşin û hwd.

2- **Girseyên Temaşevan:** (Ne rêxistinkirî ne)

Ew kesên ku bi armanca temaşekirin û guhdarkirina çalakiyên cur bi cur hatine cem hev û kom bûne.

Mînak: Girseyên ku ji bo temaşekirina şanoyekê hatine cem hev.

3- **Girseyên Xwepêşandanê:** (Rêxistinkirî ne)

Der barê hizir an jî baweriyekê de alîgir an jî dijber in. girseyên ku ji bo piştgiriyê tên cem hev, ji wan re "girseyên xwepêşandan" tê gotin.

Mînak: girseyên raperîn, an jî serhildanan…

Pirsên Nirxandinê:

1- Taybetiyên girseyên civakî, çi ne?

2- Beşên girseyên civakî binivîse û yekê ji wan şîrove bike.

3- Girseyên derdora xwe yên rêxistinkirî û yên nerêxistinkirî, lîkolîn bikin.

Wane 8

Beşên Civakî

Her civak, ji gelek beşan pêk tê. Ev taybetî di heman demê de, dewlemendî û rengîniya civakê vedibêje. Pirbeşbûn, pêwîstiya xwezaya civakê ye. Civak, li ser vî bingehî dibe civak. Di civakê de, beşên civakî li ser vî bingehî hev û du temam dikin û pêdiviyên civakê pêk tînin. Beşên civakî, li gorî taybetiyên civakî yên hevpar ên kesan, dabeşbûna civakê ne. Lê têkiliyên van kesan, rasterast bi hev re tune ne û ne merc e ku li cem hev bin. **Mînak:** karker, bijîşk, cotkar, misilman, xirîstiyan, jin, mêr û hwd.

Em dikarin beşên civakî, di çend xalên bingehîn de, wiha diyar bikin:

1- Zayend:

Civak mirovan li gorî zayenda wan dabeş dike.

Weke: zilam-jin, keç-kur

2- Li gorî temen:

Bi rengekî xwezayî mirov li gorî temenên xwe dibin nifş (zarok, ciwan, kal). Ev her sê nifş weke hemnifş tên nasîn.

3- Li gorî olê:

Kesên hemol û hemanbawerî mîna: misilman, xiristiyan, êzidî, cihû û hwd dihundirîne.

4- Li gorî aboriyê:

Li gorî rewşa aboriyê, şêweyê jiyana mirovên ku weke hev in an jî di heman astê de ne, digire nava xwe.

Weke: karker, karmend, dewlemend, xizan, bazirgan û hwd.

5- Beşên Etnîkî:

Ev xal jî, endamên heman etnîkê digire nava xwe. Em dizanin ku di heman civakê de komên etnîkî yên gelên cuda cuda bi hev re dijîn, hene.

Mînak: Li Kurdistanê komên etnîkî mîna: kurd, tirk, ereb, asûr, ermen û hwd; li Amerîkayê: kesên efrîkayî, ingilîz, fransî, ispanî û hwd, bi hev re dijîn. Di civakekê de ev komên etnîkî, ji ber ku taybetiyên wan ên etnîkî û netewî yek in, heman cihî parve dikin û di heman beşê de cih digirin.

Lê belê, pergalên serdest her tim hewl didin komên civakî yên ku dijberî pergalê tev digerin da ku xweseriya xwe biparêzin, ji hev bixin. Nûjentiya kapîtalîst, ji bo ku hêza berxwedana civakê lawaz bike sinc, hevkarî û hemû taybetiyên civakê, ji xwe re armanc digire û êrîşî nirxên wê dike. Hin bi hin civakê lawaz dike û dixe bin bandora xwe.

Dewlemendiya civakê vediguherîne, parçe parçe dike û beşên ziyandar û metirsîdar di nava wê de, çêdike. Li ser vî bingehî, civakê dixe bin çavdêriya xwe. Ev jî dibe sedem ku civak, bi taybetî ciwanên wê, ji rastiya xwe (çand, sinc, kevneşopî, civakîbûn) dûr bikeve. Civak parçe dibe û di encamê de lawaz dimîne; bi xwe ve mijûl dibe û di bin parçebûnê de ji aliye civakî ve, dijberî û dijminahiya hev û du dike û li beranberî hev û du radibin û di dawiyê de ji civakbûnê derdikevn.

Mînak: Ciwanên roja me ya îro ku girêdana wan bi cîhana nîgaşî ve tê girêdan û ji jiyana xwe ya civakî dûr dikevin.

Bûyerên Civakî:

Di têkiliyên ku di navbera mirovan de derdikevin holê, bûyerên ku tenê carekê çêdibin û cih û dema wan diyar, ji wan re **"bûyerên civakî"** tê gotin. Bûyerên civakî, berçav û taybet in.

Mînak:

Komkujiya Helepçeyê bûyerek e.

Diyardeyên Civakî:

Bûyerên civakî yên ku tên dubarekirin û ji aliyê cih û demê ve taybetiyeke wan heye (cih û dem destnîşankirî ne), ji wan re **"diyardeyên civakî"** tê gotin.

Mînak: Her sal pîrozkirina Newrozê, bibîranîna roja 12'ê Adarê, roja karkeran.

Pirsên Nirxandinê:

1- Girîngiya beşên civakî diyar bike.

2- Çend beşên civakî binivîse.

3- Rola pir beşên civakî di avakirin û xerakirina civakê de, lêkolîn bike.

BEŞA DUYEM

DÎROKA CIVAKNASIYÊ

- **Pêşketina civaknasiyê di dîrokê de. Ibin Xeldûn**
- **Comte - Harriet**
- **Pêşketina civaknasiyê di dîrokê de. Markis - Dorkihaym - Vêber**
- **Civaknasiya Pozîtîvîzim**
- **Civaknasiya Azadiyê**

Wane 1

Ibin Xeldûn

Ibin Xeldûn (1332-1406):

Di dîroka civaknasiyê de, gelek zanyar û fîlozofan zanista rêbaz bi kar aniye. Rêbazên zanyaran wiha ne: Ji aliyê zanista rêbaz ve, kesê ku cara yekem di zanista civakê de xebata berfireh a rêbazî (metodîk) pêk aniye, dîroknasê Tûnusî Ebdurehman Ibin Xeldûn e (1332-1406). Ibin Xeldûn ew e yê ku bingehên destpêkê yên zanista civakî, bi rêbaza zanistî nivîsandiye. Gelek lêkolînên derbarê derûniya civakî, aboriya civakî, felsefeya dîrokî, nijadnasî (etnografya), erdnîgariya civakî, bajarvanî, zanista mirov a civakî û hwd, her wiha gelek têgehên civakî yên girêdayî zanistên civakî jî, bi pêş xistiye.

Ev ramanên Ibin Xeldûn, encex di sedsala 19'an de hatine têgihîştin û ji bo xebatên gelek zanyarên Ewrûpayî, bûne bingeh. Di serdema Ibin Xeldûn de, civaka misilman hêdî hêdî ber bi windabûnê ve diçû. Li gorî Ibin Xeldûn, civak bi aborî û kesên xwe tenê, nikare dewam bike; ji ber vê yekê jî dewlet ji wê civakê re pêwîst e. Tevî ku Ibin Xeldûn bi xwe dibêje civakên xwezayî û komînal tu caran dewlet li ser wan nayê sepandin, lê di vê xalê de, bi rengekî hovane li van civakan dinêre; ji ber ku dewlet li hember van civakên ku xwe bi rê ve dibin, neçar e li dijî wan raweste yan jî bixebite.

Ibin Xeldûn, şaristanî li gorî hebûna dewleta misilman nas kiribû. Li gorî lîkolînên wî yên bi rêbazên zanistî, temenê dewletê dike pênc qonax:

1- **Nijadperestî:** Ev qonax ya avakirin û destdayîna li ser berheman e. Di vê qonaxê de, gel di hemû beşên jiyanî (ramyarî, berpirsyarî, parastin, perwerde…) de, beşdar dibe.
2- **Zordarî:** Desthilatdar di vê qonaxê de, hewl dide ku kesên derdora xwe desteser bike û yên ku li dijî wî derkevin, tune dike.
3- **Valahî:** Di vê qonaxê de, kar li ser rêxistina jiyana aborî tê kirin û leşker li ser her dagirkeriyekê tên xelatkirin .
4- **Razîbûn:** Rewşa heyî her kes pê razî ye û yê serwer bi her tiştên ku beriya wî hatine avakirin, razî ye.
5- **Mezaxtina zêde:** Di vê qonaxê de, yek ji taybetiyên wê ew e ku her tiştên mirovên beriya wan çêkirine, winda dikin, girîngiyê nadin berjewendiyên dewletê û yê serwer jî keda leşkeran dixwe.

Dîroka her dewlet û civakekê li gel Ibin Xeldûn, bi vî awayî bi dawî dibe.

Rexneyên civakî yên ku li Ibin Xeldûn hatine kirin:

1- Pêwîst e civak li ser taybetiyên xwezayî, sincî û ramyarî bihizire. Berovajî nêrîna ku Ibin Xeldûn dixwest bide diyarkirin, civakên destpêkê ne hov in; heger ku ew civak hov bûna, dê nikarîbûna bi hezarên salan berdewam bikirana.
2- Dewlet ji bo berdewamiya civakan, nabe çare; ji ber ku temenê wê biçûk e.
3- Ibin Xeldûn pirsgirêkên serdema xwe çare nekirine, tenê rewşa heyî şîrove kiriye.
4- Civaknasiya Ibin Xeldûn, bûye jêdera herî girîng ji bo deshilatdariya navendî ya Ewrûpayê. Ji ber vê yekê dewletên Ewrûpayê, civaknasiya wî bi rengekî pir mezin di nav herêmên me de belav dikin, lê bi rengekî ku temenê dewletê pê re kurt bikin û berhemên li vê deverê ji xwe re bibin.

Pirsên Nirxandinê:

1- Ibin Xeldûn dibêje: **"Civaknasî"** hûnera avakirina mirovahiyê ye, vê gotinê lêkolîn bike.

2- Her dewlet li gorî Ibin Xeldûn di çend qonaxan re derbas dibe, şîrove bike.

3- Rexneyên ku li ser civaknasiya Ibin Xeldûn hatine kirin, şîrove bike.

Wane 2

Comte - Harriet

Comte Comte (Ogêst Komt) 1798-1857

Comte civaknasê fransiz, cara destpêkê têgeha zanista civakî "**civaknasî**" bi kar aniye. Civaknasiya ku Comte bi pêş xistiye, xwe digihîne felsefeya mekanîkî û berdewamiya wê xwe dispêre pêşketina zanistên pozîtîf. Comte, weke rêbaz bêyî ku hêmanên cih û demê li ber çavan bigire, heyînan parçe dike. Vê rêbaza zanistî, bi zagonên mutleq ve girê dide. Weke awayên ku hene, li ser civak û civaknasiyê jî meşandiye. Hem ji aliyê çêbûna zanistan ve, hem jî ji aliyê rêbaza zanistî ve hatiye rexnekirin. Lê di rastiyê de hebûna pozîtîfîzmê weke rêbaz û ramana desthilatdar, rê li ber bandoreke diyar li ser şopedarên civaknasiya Comte vekiriye. Di nîva sedsala 19'an û pê de têgeha civaknasiyê, ji aliyê Comte ve hatiye vekirin. Piranî di bin navê civaknasiya pozîtîfîst de, tê lêkolînkirin.

Peyva civaknasiyê li rex Comte di sê wateyan de hatiye nîşandan; despêkê navê wê kir xwezaya civakî, piştre guhert û kir fîzîka civakî, paşê jî navê civaknasî (Sosyolojî) lê kir. Felsefeya Comte a civakî li firansayê belav bû.

Comte dibîne ku hizira mirov di sê deman re derbas bûye:

1- **Dema Teolojîk (Lahût):** Di vê demê de lêkolîn li ser hebûnê dihat kirin; gelo xwedayekî yan jî gelek xwedayan ev gerdûn avakiriye?

2- **Mîtafîzîk-Felsefe (Tiştên ne li ber çavan):** Di vê demê de, mirov tiştên li ber çavên xwe bi xwedayekî ne li ber çavan guhertin. Ev dem li gorî nêrîna Comte; mirov ji rastiyê, ber bi diyardeyê ve diçe.

3- **Rastiya Tekez (Mutleq):** Ev dem girêdana mirov bi xwezayê re qut dike. Êdî li vir serweriya mirov li ser xwezayê çêdibe û hêza wî ava dibe. Mirov dighêje rastiya hebûna xwedayekî ji gerdûnê re.

Harriet Martineau (Haryêt Martîno) 1802-1876:

Harriet nivîskareke civakî û ji Birîtanyayê ye. Weke yekemîn civaknasa jin tê nasîn. Derbarê aborî, felsefe û civakê de nivîsiye. Ji ber rêzeçîroka xwe ya bi navê "Wêneyên Zelal Ên Aboriya Ramyarî" bi nav û deng bûye. Di vê rêzeçîroka xwe de ya ku di navbera salên (1832-1834) de belav bûye, zanista aboriyê ji bo xwînerên normal şîrove kiriye. Di sala 1846' an de serdana Misir û Qudsê kiriye û ji ber vê yekê pirtûka "Jiyan Li Rojhilatê" di sala 1848'an de nivîsandiye. Her wiha gelek berhemên Comte wergerandiye. Augus-te, nivîsên ku ji hêla Harriet ve hatine wergerandin, dipejirîne û ji xwendekarên xwe re dibêje wan nivîsan wergerînin fransizî. Nav û dengiya Comte encama wergerandina nivîsên wî ne. Tevî ku Harriet pirtûkên Comte wergerandine Înglîzî jî, lê ew nebûye şopedara rêya pozîtîvîstê.

Jiyana wê

Harriet di zaroktiya xwe de ji aliyê tenduristî ve asteng bû, anku deng baş nedibihîst. Ev pirsgirêk pê re mezin bû û bû kerrbûn, her wiha hevsengiya wê ya sinirî qels kir. Harriet di

malbeteke xwedîhişmendiyeke kevnperest de mezin bû. Dayîka wê her gav ew fêrî bermaliyê (jineke ku tenê bi kêrî karê malê tê) dikir. Wê ev tişt bi zorê li ser keça xwe disepand û bi karên mîna terzî, tevinkarî… Mijûl dikir û ji xwendin û nivîsandinê dûr dixist. Dayîka wê xwendin û nivîsîn weke karên mêran didît û tenê karê malê weke karê jinê didît. Lê Harriet bi dizî fêrî xwendin û nivîsandinê dibû.

Bavê Harriet di tevinekariyê de kar dikir. Dema bavê wê di karê xwe de şkest, guhertin di jiyana wê de çêbû. Vê yekê hişt ku ji karê malê dûr bikeve û dest bi nivîsandinê bike. Harriet di bîranînên xwe yên kesayetî de, şkestina bavê xwe weke bûyera herî xweş di jiyana xwe de nîşan dide, ji ber ku derfeta nivîsandinê jê re peyda kir.

Karê wê:

Harriet di sala 1821'ê de, dema ku dest bi nivîsandina gotaran kir, navê xwe di kovareke ingilîzî guhertibû anku navê xwe yê resen tê de bi kar neanîbû. Jixwe destpêka nivîskara ingilîz Harriet ya ku paşê bû navdartirîn nivîskar, wiha bû. Her wiha Harriet pirtûka felsefeya pozîtîvîst a Comte jî ji firansizî wergerand ingilîzî.

Harriet di qada wêjeyê de weke civaknas û aborînaseke ramyarî hatibû naskirin. Her wiha berhemên wê gihaştibûn 20 pirtûkan û jînenameyek jî li pey xwe hiştibû. Piştî weşandina pirtûka xwe ya bi navê "Seyranê", xwe ji bo berevaniya di ber jinên ingilîz de vala kiribû. Di navbera salên (1852-1866) de bi rengekî rêk û pêk di rojnameya Dêlî Niyûz (Daily News) de nivîsiye, jimara gotarên wê jî nêzî 1600'î ye. Lê nivîsên wê ji hemû pirtûkên civaknasiyê hatine dûrxistin. Di serdemeke ku hişmendiya mêrantiyê serwer e, ev kiryar tiştekî gengaz e.

Ev dem a Vîktorya ye, lê Harriet di vê demê de, ne tenê ji bo xwe, lê ji hemû jinên cîhanê re, li hember hişmendiya zilam a serwer, tê koşiyaye.

Harriet dibêje: **"Dema ku mirov civakekê binirxîne, pêwîst e hemû beş û aliyên ku civak jê pêk tê, lêkolîn bike û saziyên ramyarî, aborî, olî û civakî yên sereke, bi rengekî giştî dahûrîne".**

Ji bo ku rewşa jinê ya di bin serweriya zilam de bê naskirin, Harriet rewşa jiyanî ya di dema xwe de nirxandibû.

Di qonaxa Vîktorî de, piraniya sazî û pîvanên civakî bi serweriya zaynedî dihat avakirin. Piraniya saziyên civakî bi rêya zilaman dihat meşandin, lê karê jinê tenê di malê de dihat dîtin. Weke em dizanin, dûrbûna jinê ji jiyana civakî, sedemeke sereke ya berdewamiya şerên di Ewrûpayê de bû.

Harriet di sala 1834' an de serdana Amerîkayê kiribû, li wir bandor li Jêms Madîson (serokê Amerîkayê yê wê demê) kiribû ku sûcê bidarvekirinê betal kir.

Dîsa Harriet têkoşîna xwe ji bo mafê jinê berdewam kir û rewşa jinên Amerîkayê rexne kir.

Harriet dibêje: **"Hişmendiya jinê di çarçoveya sînorên ku zilam jê re destnîşan kiriye, bend bûye"**.

Pirsên Nirxandinê:

1- Comte, mirov di çend deman re derbas kiriye ?

2- Civaknasiya Comte binirxîne.

3- Têkoşîna Harriet ji bo çi bû ?

4- Harriet çi bandor li Îngilistan û Amerîkayê kiribû ?

5- Çima nivîsên Harriet di pirtûkên civaknasiyê de cih negirtibû? lêkolîn bike.

Wane 3

Marks – Durkheim – Veber

1-Marks: (1818-1883)

Karl Marks, civaknas û fîlozofekî Alman e. Di salên 1818-1883'an de jiyaye. Di sedsala 19'an de li ser felsefeya materyalîzmê (madî), pergala xwe ava kiriye. Felsefeya Marks; weke materyalîzma dîrokî û materyalîzma diyalektîkî dibe du beş.

Karl Marks

Marks, diyar kiriye ku fîlozofên beriya wî, tenê civak nirxandiye, lê tu kesî hewldanên guhartinê nedane diyarkirin. Marks, ev yek kêm dîtiye û di heman demê de jî pêwîstiya guhartina civakê jî aniye holê. Hewldanên zanistî yên Marks ji ber vê sedemê, bi felsefeyê tenê re sînordar namînin; dîrok, civakbûn, aborî û felsefeyê jî bi hev re hembêz dikin. Ji ber vê yekê, civaknasê ku herî zêde li ser pirsgirêkên civakê rawestiyaye û pêşinyarên çareseriyê kirine, Marks e.

Li gorî Marks, mirov bi keda xwe ya civakî dibe mirov û civak ji du çînan pêk tê, **1.** Çîna kedkar **2.** Çîna kedxwar (desthilatdar). Li gorî Marks, hemû pirsgirêkên civakê bingehê xwe ji kedxwariyê digirin.

Marks, berdewamiya civakê di têkiliyên aboriyê de dibîne. Ango aboriyê bingeh digire û civakê weke hebûneke daringî digire dest, ji aliyê wê yê rewanî ve girîngiya pêwîst nîşan nade. Her wiha, desthilatdariya zilam, koletiya jinê û nakokiya vê mijarê zêde nabîne. Her wiha, taybetiyên ekolojîk di felsefeya wî de zêde tune ne.

Dahûrîna Marks a çînî, xwe dispêre têkiliyên sermiyanî (kapîtalîst). Marks, di dema xwe de bi belgeyên kêmpeyda, hewl dabû ku civak û dîrokê baş nas bike. Ji ber ku dixwest civakeke azad biafirîne, dahûrandinên girîng derbarê civak û dîrokê de bi pêş xistine. Tiştê Marks derxistiye holê ji bo civakan girîng e, lê belê di encamê de, wî nikarîbû civakeke azad bi pêş bixe. Sedema wê jî ew e, hişmendiya ku pejirandiye û amûrên bi kar anîne, bi giştî nikarîbûn xwe ji derveyî pergala heyî, dûr bixin. Ev jî bûye sedem ku tiştê Marks bi pêş xistiye, bikeve xizmeta desthilatdariya kapîtalîzmê; ji ber ku **Marks di bingehê felsefeya xwe ya civakî de, xwe dispêre sê stûnan:**

1- Aboriya Îngilistanî ya Adem Smeth
2- Felsefeya Almanî ya dîrokî (Hêgil)
3- Civaknasiya Fransayî (Şoreşa Fransayî)

2- Emile Durkheim (Êmêl Durkhaym) 1855-1917:

Emile Durkheim, civaknasekî fransiz e û di salên 1855-1917'an de jiyaye. Durkheim, civakê weke sazûmaniyekê dinirxîne. Çawa ku di nava sazûmaniyekê de hemû lebat bi hev re di nava diyardeyeke hevgirtinê de ne, civak jî weke van lebatan e ku bi hev re di nava hevgirtinekê de ne.

Emile Durkheim

Li gorî Durkheim, di encama yekbûna vê hevgirtinê de, civak ava dibe. Durkheim civakê ne li derveyî mirov, lê belê di nava mirov de dibîne.

Derbarê civakê de, li gorî qadên lêkolînan, civak sê beşan digire dest; zanista civaknasiya giştî, teşenasî (morfolojî) û zanista civaknasiya fîzyolojî.

Civak hebûneke ku nayê parçekirin, zagonên ku civakê bi rê ve dibin, ne li gorî jiyannasî û derûnnasiyê ne.

Lê civak di rêya taybetiyên civakî, kevneşopî, ziman, sazûmaniyên zagonî û hestên civakî re tên birêvebirin.
Durkheim, civaknasiyê dike du parçe:
1- Çêbûna morfolojîyî. 2- Belavbûna kar.
Bi vî awayî civak jî dibe du parçe.

1- Civakên xwedîderfetên sînorkirî, taybetiyên wan ev in:

- Hov in, komkirina wan belavbûyî ye.
- Saziyên birêvebirina civakê tê de tune ne.
- Ol serwer e û rengê xwe dide jiyanê.

2- Civakên xwedîderfetên berfireh:

- Zana ne, komkirina wan sazkirî ye.
- Sazî û desteyên civakî tê de peyda dibin.
- Desthilatiya zagonî wê bi rê ve dibe.

1- Max Veber (Maks Vêber) 1864-1920:

MaksVêber

Civaknasê Alman Max Veber, di salên (1864-1920) de jiyaye. Li gorî Max Veber, aliyê ku herî zêde derketiye pêş, hevbandorkirina civakî ye. Li gorî wî, civak di bingehê xwe de ji hevbandorbûnê, xwe diyar dike. Max Veber dibêje: **"Dîrok û awagirtina giyanê civakî, tu carî nikarin bi zagonên xwezayî bên diyarkirin"**, ji ber ku zagonên xwezayî û dîrokî, afirîneriya civakê bi xwe re derdixin holê.

Mirov e yê ku wateyê dide karê xwe. Karê mirov di rêgezên reftariya civakî de, tên xuyakirin. Em dikarin diyardeyên civakî bi rêbaza hevsengî yan jî bi awayê angaştî di desthilatiyê de bi sê awayan rêz bikin:

1- Kopya (Lasakirin-teqlîd)
2- Karîzmatî (Çalakî)
3- Zagonî.

Li gorî Veber, di civaknasiyê de, karê civakî mijara sereke ye. Karê civakî wekî wêneyê reftarên mirov, pênase dike. Veber, karê civakî weke dualîzmê dide xuyakirin.

1: Li gorî watedayîna kesayetî.

2: Li gorî asta komkirî ya di nava civakê de.

Veber civaknasiyê li olê vedigerîne, bi taybet beşek ji ola xiristiyanî. Ev jî bûbû sedemeke sereke ku pir rexne lê bên kirin. Civakê dike çend çîn û wê li ser binghê bîrokrasiyê ava dike. Dewlet û ol tu caran bi hev re birêveberiya civakê nakin; ji ber ku ol sincê civakê bingeh digire û dewlet çînîtiyê ji xwe re bingeh digire.

Pirsên Nirxandinê:

1- Marks civaknasiya xwe spartiye çi?

2- Marks di civaknasiya xwe de, doza çi dike û sedemên vê dozê çi ne?

3- Civaknasiya Durkheim binirxîne.

4- Veber civakê çawa dibîne? Lêkolîn bike.

Wane 4

Civaknasiya Pozîtîvîstî

Pozîtîvîst tevgereke zanistî ye, di nîva sedsala 19'an de, li ser destê Comte û bi alîkariya Saint Simon (San Sîmon) derketiye. Pozîtîvîzim weke ku tê zanîn, rêbaza zanistîbûna dîrokî ye (dîrokê bi awayekî zanistî dinirxîne) û hizira mirov di sê deman re derbas dike.

Comte dibêje: "**Mirov di sê deman re derbas bûye; olî, mîtafîzîkî û zanistî. Ya rast ew e ku mirov xwe bi zanistê ve bigire û xwe bi pêş bixe**".

Li gorî pozîtîvîzimê, pêwîst e her tişt di cîhanê de, werin



ezmûnkirin (tecrube) û zanistên ku nayên bidestxistin, ji bin siya zanistiyê derdikevin.

Ji ber vê yekê eger derûnnasî neyê têghiştin, em ê çawa ezmûnên xwe li ser civaka mirovan pêk bînin?

Pozîtîvîzm li gorî nakokiyên wê demê, ji rewşa jiyanî ya mirovan re, xweş çare bû, lê ew civaknasî ne her dem dikare bi karê xwe rabe. Beşên herî zêde yên ku mirov têkilyên xwe tê de ava dikin, girêdayî baweriya mirovan in û li ser vî bingehî çand û sincê civakê tê berdewamkirin û parastin. Lê pozîtîvîst, aliyên girêdayî bîr û baweriya mirov û tiştên di xwezaya wî de,

napijirîne. Pozîtîvîst, ol û baweriyên girêdayî olê weke dijmin ji pêşketina zanstî re dibîne.

Abdullah Ocelan, vê nêrînê rexne dike û dibêje: **"Pozîtîvîst çi qasî hewl da ku xwe ji mîtafîzîkê dûr bixe, di encama xwe de ji mîtafîzîkê kûrtir bûye"**. Pozîtîvîst di milê sincî de nêzîkî marksiyê bû, çînîtiya zanistî ku tê de hin zanist ji yên din girîngtir in, careke din pê re derdikeve. Di dema pozîtîvîstê de, gelek zanist li pêş ketin û li ser vê yekê civak bûye mijara ezmûnê. Gelek fîlozof di bin siya pozîtîvîstê de hatin naskirin û weke şopedarên vê rêbazê xwe dane naskirin.

Rexneyên ku li ser civaknasiya pozîtîvîzmê hatine kirin, ev in:

1- Karl Popper dibêje: **"Comte dema ku li ser zagonên pozîtîvîzmê diaxive, tu cudahiyê naxe navbera rêgezên zagonî û rêgezên civakî".**

2- Der barê rexnekirina civaknasiya Comte de dibêje: "**Objektîvîstên (heyberên) pozîtîvîst, angaşt dikin ku civakê bi awayekî zanistî rave dikin, lê tevî vê yekê, objektîvîzma pozîtîvîst dibistaneke bîrdozî ya herî kêm, herikîn û pêşketina civakê nas dike**".

3- Abdullah Ocelan dibêje: **"Mirov hebûnek e ku ji du milan pêk tê; yek rewanî, yek jî heyberî ye. Tu kes nikare mirov ji giyanê wî cuda bike, yan jî ezmûnan li ser giyanên mirovan çêke**".

4- Di mîtolojiyê de xweza bi can û candaran tijî ye. Her çi qas di roja me ya îro de ev yek weke baweriyeke zarokan were dîtin jî, lê dema ku mirov asta zanistê ya gihiştiyê li ber çavan bigire, ya rastî mirov dê bibîne ku ev rêbaz rast e. (Pozîtîvîzima Comte, mîtolojiyê rêbazeke zaroktî dibîne)

Pirsên Nirxandinê:

1- Pozîtîvîstê pênase bike?

2- Armanca pozîtîvîzmê bide xuya kirin?

3- Rexneyên ku li ser pozîtîvîzimê hatine kirin, lêkolîn bike.

4- Gelo di roja me ya îro de, pozîtîvîst dikare bibe bersiva çareya civaka me? Lêkolîn bike.

Wane 5

CIVAKNASIYA AZADIYÊ

Civaknasiya azadiyê, ew civaka komînal, xwedîçand, ramyarî û sincî ye. Di vê civakê de mirov azad e, ne li gorî berjewendiyên xwe yên taybet e.

Mirov di civaka azad de, ji ber ku armanca her mirovî pêşketina civakê ye, li gorî çand, sinc û berjewendiyên civakê dixebite.

Civaknasiya azadiyê weke têgeh, lêkolîn û çareya pirsgirêkên cîhanî û civaknasiyê, ji aliyê civaknasê kurd **Abdullah Ocelan** ve, hatiy avakirin.

Di pênaseya dibistanên civaknasiyê de, yên ku pêwîst e lêkolînan derbarê avabûna xwezaya civakî û pêşketina wê de bingeh bigrin û civakek ramyarî û sincî biafirînin, divê bê têghaştin ku sîstema şaristaniya demokratîk e.

Nirxandina Dibistanên Civaknasiyê:

Her dibistanek ji dibistanên civaknasiyê, rêbazên cuda cuda bi kar anîne. Sosyalîzma zanistî, çînîtiyê digire dest û kesayet pêkhateya bingehîn a lîbralîzmê ye. Ibin Xeldûn, dewletê bingeh digire.

Girîng e ku em yekeya civaknasiya azadiyê ya bingehîn, weke civaka sincî û ramyarî destnîşan bikin; ji bo ku aliyên dîrokî bigire nava xwe.

Civaka sincî û ramyarî, vegotina herî dîrokî ya civakê ye. Mirov dikare sinc û ramyariyê bixwe, weke dîrokê jî bixwîne.

Civaka ku aliyê sincî û ramyarî di nava xwe de bigire, ew civak nêzî yekpareya heyîn û pêşketina xwe ye.

Heger dewlet, çîn, mêtingeh, bajar, desthilatî û netew nebin jî, civak heye, lê mirov nikare di civaka bê sinc û ramyarî de, bihizire.

Di civaka azad de, pêwîst nake têgînên weke (koletî, kapîtalîst, sosyalîst) werin bikaranîn.

Civaknasiya Ewrûpayî weke çareyeke demkî bû, ji bo civaka Ewrûpî û sedema ku pergalên takekesî hatine avakirin, ew e ku çareyek bi giştî ne hatiye afrandin.

Taybetiyên Civaka Azad:

1- Civaka sincî û ramyarî, taybetiya bingehîn a civaka mirov e. Pêwîst e ji destpêka wê heya dawiya wê bi berdewamî were lêkolînkirin.

2- Civaka sincî û ramyarî li dijberî sîstemên şaristanî yên ku li ser sêmendiya bajar, çîn û dewletê hiltên, radiweste.

3- Civaka sincî û ramyarî weke dîroka xwezaya civakî, bi sîstema şaristaniya demokratîk re, di nava hemahengiyê de bi pêş dikeve.

4- Civaka sincî û ramyarî, civaka herî azad e. Şoreş û qehreman, dikarin rola destnîşankar bilîzin.

5- Civaka sincî û ramyarî, civaka demokratîk e. Demokrasî, tenê li ser bingehê heyîna civaka sincî û ramyarî ku civakeke vekirî û azad e, dikare wateyê wergire. Civaka demokratîk ku kes û kom tê de dibin kirde (subje), awayê birêveberiyeke berhemdar e.

6- Civakên sincî û ramyarî, di nava nakokiyan de, li hemberî dewletê tên. Dewlet her tim dixwaze zagonê di şûna sinc de û birêveberiya bîrokratîk jî (awa û rêbazên birêvebirina dezgehên hikûmî) di şûna ramyariyê de, bi kar bîne.

7- Aştî bi vîna hêzên civaka sincî û ramyarî, ya hêzên yekdestî yên bi dewlet (fedralî), bi rengekî bêçek û bêkuştin, bi hev du re bijîn, gengaz dibe. Rewşên aştiya mercdar, **"lihevhatina demokratîk"** jê re tê gotin.

8- Pênasekirina civaka sincî û ramyarî bi navên koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst, weke ku hev du bişopînin, li şûna ku vebêjer be, rola nixumandinê (perdekirin) dilîze.

9- Nabe ku weke armanca dewletnetew, çînatî û takekesî bibe armanca civaka sincî û ramyarî. Nabe ku li derveyî demokrasiyê, bibeze. Encax vîna azad a civaka sincî û ramyarî, mafê destnîşankirina armanc û navên civakê diyar bike.

Pirsên Nirxandinê:

1- Civaknasiya azadiyê pênase bike.

2- Encama nêrînên dibistanên civaknasiyê şîrove bike.

3- Pêşinyarên civaka azad şîrove bike.

4- Taybetiyên civaknasiya azadiyê şîrove bike.

BEŞA SÊYEM

CIVAKNASÎ Û ZANISTÊN DIN

- **Civaknasî û Dîrok**
- **Civaknasî û Ramyarî**
- **Civaknasî û Aborî**
- **Civaknasî û Derûnnasî**

Wane 1

Civaknasî û Dîrok

(Dîrok di roja me ya îro de veşartî ye û em destpêka dîrokê ne)

Dîrok ne tenê ji bo civaka mirov, lê belê ji bo tevahiya pêkhateyên gerdûnî, roleke afrîner dilîze. Dîroka civakî; di çêkirin û pêkanîna mirov de, rola wê heta dawiyê girîng e. Danasîna herî zelal a dîroka gerdûnî, weke zemîna rastiya pêşketina civakî ye. Dîroka mirovbûyînê, bûye wekî du çemên ku diherikin.



1- Civaka Xwezayî:

Di vê çarçoveyê de, civaka mirovahî ne tenê dîroka mirov e, ya rast dîroka gerdûnê ye. 14 mîlyar sal bi rengekî sivik weke temen tê gotin, ev dem dîroka gerdûnê ye. Ji ber vê yekê jî divê mirov girîngiyê bide mirov, civak û dîroka wan. Li gorî baweriya hevpar a zanistî, mirov heta piştî serdema qeşayê ya dawîn ji pergala klanê ya ku ji **20-50** kesî pêk dihat, nebihuriye. Civaka klan weke yekîneyên pêşî yên komînên biçûk hatine dîtin. Mirovatiyê **%98** ji dîroka xwe bi civakeke

bi vî awayî derbas kiriye. Civaka mirovahiyê bi awayê klan dest pê kiriye û li gorî texmînan, beriya **100.000** salî zimanê sembolîk bi kar aniye. Agahiyên jeobiyolojîk ên Rojhilata Navîn piştî serdema qeşayê ya dawîn li derdora **20.000** salî pêk hatine. Şoreşa mezin a zimanê sembolîk li ser avahiya erdinîgariya sîstema çiyayên **Toros-Zagrosê**, komên sîstema êlên Aryenî pêk hatine. Rola vê komê di şoreşa bajar û cotkariyê de jî sereke ye ku ev jî taybetiyeke girîng a rastiya piştraskirî ye. Tevahî xebatên zanistî yên jeolojîk, arkeolojîk, antropolojîk, etnîsîtî û ziman piştrast dikin ku şoreşa gund-cotkariyê bi awayekî bingehîn li sîstema quntara Çiyayên Toros û Zagrosê bi pêş ketiye. Perestgeha **Ûrfa-Xerab Reşkê** piştrast dike ku mirovan ji sîstema êlên nîvkoçer, gav ber bi avakirina gundan ve avêtine. Birêveberiya kom û gundan (demokrasiya despêkê) li dora pergala hevpar a bicihbûyî, bûbû hîmê danûstandina despêkê û şoreşa hunerî. Derbarê vê yekê de, mirov dikare hin taybetiyên bi heman rengî diyar bike. Çemê Xalan, Newala Çorî û Orkêş hêza belavbûn û bicihbûna çanda Xerab Reşkê nîşan didin. Di dema 6000-4000 B.Z de berhema hevdîtina her du çandan Semîtîk-Aryen ên ku têkliyên wan bi hezarên salan hatine avakirin, bajarbûnê ava kiriye. Li gorî antropolojî, etnîk û çavdêriyên dîrokî, komên bi navê Semîtîk li derdora **4000 B.Z** ji beyabana mezin heta bi çolên Erebistan û Îranê, sîstema êlan bi awayekî berfireh pêk anîne. Ev yek ji qonaxên bignehîn ên dîroka gerdûnê ne. Vê koma ziman û çandê bi xwedîkirina lawiran û cotkariyê, xwe parastiye û li pêş xistiye.

2- Şaristanî:

Li gorî arkoloj û dîroknasan, Sumer encama lihevkombûna du çandan e. Bi vê qonaxê re desthilatdariya xwe li ser komkirina berhemên zêde û kolekirina jinê, ava dikin. Destaneyên li

ser navê qralê pêşîn **Gilgamiş** û xwedawenda bajêr **Înana**, vê rastiyê baş şîrove dikin û nêzîkatiya her du çandan (Semîtîk-Aryen) ji hev nîşan dikin.

Koletiya jinê her ku diçû, zortir dibû û pê re jî rê li ber desthilatî û hiyerarşiyê vedibû û ji netewdewletê re dibû bingehek. Êdî bi jinê re, gel jî xwe bindest dibîne û rewşa civakbûnê pir zehmet dibe. Di vê qonaxê de cudahî dikeve navbera jin û mêr de, yek ji yê din baştir tê dîtin. Li Misirê jî pramîdên mezin bi koletiyê re, hatine avakirin. Her wiha zîgorat ên ku civakê parçe parçe dikin, ji bo desthilatdariyê dibin weke çareyekê. Bi hatina Aleksander û hêzên dagirkiriyê yên girêdayî wî re, pêvajoyeke nû ku mirov li van welatan êdî di nava windabûnekê de ye û tu rêgezên civakê namînin, dest pê dike. Her ku bi pêş ve diçe, pirsgirêk kûrtir dibin. Êdî zilamên serwer ên ku jin û malbat ji xwe re kole didîtin, ew jî dibin koleyên pergala heyî. Ev pergal bi hiyerarşiya (çînîtî) malbatî ya girêdayî qiralan ve, tê girêdan. Tevî ku gelek serhildan û raperînên gelan li hemberî van pergalan derdikevn jî, lê bi ser nakevin; ji ber ku civak di pişaftineke (asîmilasyon) pir dijwar de ye û gihaştiye asta ku xwe bi xwe tune bike.

Kapîtalîsta, ku pergala komkirina berhemên zêde ye û li ser kar û xebatên civakê tên berhevkirin, ji desthilatiya li ser civaka me bêpar namîne. Hin kesên ku dixwestin dijberiya kaptalîzmê bikin, bi kirinên xwe kapîtalîzm bêhtir av didan. Yek ji wan Karl Marks bû ku hizira xwe ji sê milan kom kiribû û sentezek jê çêkiribû. Di encama dawî de, xwesteka ku karker bibin şûna qiralê kevn, dida nîşandan. Kaptalîstê, xwe derbasî hemû beşên jiyanê kiriye û mirov di destê xwe de, kiriye weke robotekî. Civakbûn bûye karekî herî zehmet di hebûna kaptalîzmê de, lewma kaptalîzm hewl dide ku mirov di nava mijûlbûnekê de bihêle û wî ji civakê dûr bixe.

Pirsên Nirxandinê:

1- Dîroka civakî, pênase bike.

2- Dîroka civaka seretayî bi hevalên xwe re, binirxîne.

3- Dîrok ji Sumer dest pê dike, ev gotin rast e yan şaş e? Lêkolîn bike.

Wane 2

Civaknasî û Ramyarî

Ramyarî, hişê civakê ye. Bi pirsgirêkên birêvebirina civakê re mijûl dibe; civak ji ber gelek sedeman, bê birêveberî nabe.

Sedemên ku civak bê birêveberî nabe, ev in:

1- Civak, xwediya wan taybetiyan e ku her dem di nava guhartinê de ne; ji bo ku ev guhartin li gorî rastiya mirov bi rê ve biçin, birêveberiyek pêwîst e.

2- Di civakê de pêdivî û karên rojane yên pir zêde hene ku divê bên kirin; ji ber vê yekê pêwîstî bi danîna pilan û bernameyan heye.

3- Di civakê de, gelek karên jiyanî ku birêveberiyek ji wan re pêwîst e, hene.

4- Di civakê de, ji bo ku nakokî û têkiliyên di navbera qadên jiyanê de bên çarekirin û derbaskirin, di heman demê de divê ku di nava hevsengiyekê de bên meşandin.

5- Hejmara mirovan a zêde, sedemeke din a xebata ramyarî ye.

6- Ji ber ku ewlehiya siberoja civakê bi serê xwe pilansazî û bernameyekê dixwaze, ji bo vî karî jî bireveberî pêwîst e.

Ji van xalan jî eşkere dibe ku civak bê bireveberî nabe.

Ji ber ku ramyarî hunera sazûmankirin û birêvebirinê ye ya ku bi zanista civakî re têkildar e; zanista ramyarî, birêveberî û hêzên civakî bandor dike. Di avabûn û bikaranîna van saziyan de helwestên ku ristê dilîzin, lêkolîn dike.

Di heman demê de, di diyarkirin û berdewamkirina birêveberiyê de, ristên kom û saziyên civakî yên ji hev cuda, lêkolîn dike. Bi vî awayî, partî û desthilatdarên ramyarî, pêşengên komên mezin, hilbijartin, bîrdozî, maf, dad, zagon û civakên sivîl, bi giştî dibin mijarên zanista ramyarî.

Zanista civakî, di nava xwe de, cih dide nirxên civakî û wan lêkolîn dike. Dixwaze bizane çima ev nirx hene û çima ji aliyê civakê ve tên pejirandin.

Di roja me ya îro de, her çi qas têgeheke weke civaknasiya ramyarî tê bikaranîn jî, lê ne zêde di cih de ye; ji ber ku civak bi xwe hebûneke ramyarî ye. Bi vê zanistê, pergala desthilatdar dixwaze ramyariyê tenê bike karê hin kesan û civakê jê dûr bixe û wê bide meşandin.

Ramyariya rast ji sedî sed a bi guftûgo û tevlîbûna gel pêk tê. Ramyarî, ne diyardeyeke wisa ye ku bê gel, civak û tevlîbûnê pêk were. Ango ramyarî, neçar e demokratîk be; ji ber vê yekê jî divê xwedîsinc be!

Weke ku hatiye diyarkirin, civaknasî; civakê bi tevahî digire dest û lêkolîn dike.

Lê mirov dikare ji têkiliyên saziyên malbat, perwerde, partiyên ramyarî, ol û hwd re bibêje "**xebatên ramyarî yên civakê ne**". Lê ev nayê wê wateyê ku mirov ramyariyê, weke zanisteke ji civaknasiyê pir cuda bigire dest.

Her wiha, komên cuda yên civakê, di çêkirina birêveberiyê de çawa ristê dilîzin, lêkolîn dike. Dema ku van lêkolînan dike, ji şêwazên civaknasiyê sûdê werdigire. Divê zanistên ramyarî karibin rêkûpêkiya civakê bigihînin asteke baş û ji xwe re bikin armanc; ne bibin zanistên ku piraniya civakê di rêya wan re xwe bike desthilatdar. Der barê guhertin an jî pêşxistina rêkûpêkiya

civakê de, şêwazên nû derdixe holê. Li vir jî pêwîst e ji rêbazên civaknasiyê sûdê wergire.

Civaknasî û Zagon:

Rêzik û biryarên giştî yên ku bi riya desthilatdarî û dewletê hatine bihêzkirin, "**zagon**" ji wan re tê gotin.

Zagon di bingehê xwe de; ji bo ku berjewendiyên çîna serdest werin parastin, hatiye bipêşxistin. Her wiha ramyariya serdestan a ku li ser civakê tê sepandin, zagon e. Zagon bi awayekî nivîskî herî zêde, di pêvajoya netewdewletê de weke "rêzikên bingehîn" hatiye sazûmankirin. Di nava civakê de, kes û komên ku li gorî van rêzikan tev negerin; an tên girtin, an jî ji aliyê desthilatdariyê ve tên kuştin.

Ango ev zagon, di roja me ya îro de, di bin navê mafê demokratîk de, bi darê zorê pêk tê û weke têgehekê tê bikaranîn. Lê ev têgeh, tenê bi pejirandina mafên gel, mirov dikare bi kar bê. Her wiha têgehek e ku bi navê mafê hemdem jî tê bikaranîn. Zagon dibin kîjan nav û têgehê de were pênasekirin, di bingehê xwe de zagonên birêveberiya dewlet û desthilatdariyê ne.

Ji bo birêveberiya civakî ya pêwîst, sinc e. Desthilatdaran zagon ji bo birêveberiya xwe derxistine û ji ber rastiya civakan li dijî civakê bi kar anîne.

Di encamê de, rêzik û maf; çi qas li gorî mercên pêkhateyên civakê bin, ew qas dikarin hebûna xwe bidomînin. Berovajî vê, ew rêzik û maf heger bê bandor bibin, hebûna xwe winda dikin. Pêwîst e maf bê sinc neyê girtin. Berovajî vê, heger li gorî sinc were sazûmankirin, wê demê pêkhateya civakê nûjen dibe û bi pêş dikeve.

Lê di rastiyê de, hişmendiya dewletê tenê ji bo desthilatdariya xwe biparêze; vê yekê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne.

Ji aliyê zanistî ve, mirov dikare rêzikên mafan çawa hatine bikaranîn û çawa tên guherîn, lêkolîn bike. Di navbera pêkhateya civakî û maf de, ji bo ku pîvana bingehîn bike sinc, dikare lêkolînan bike.

Cihê ku sinc tê de lawaz be, zagon dikeve cihê wê.

Pirsên Nirxandinê:

1- Çima civak bê birêveberî nabe?

2- Ramyarî hunera sazûmankirin û birêvebirinê, bi zanista civakî re têkildar e, ev tê çi wateyê?

3- Çend mijarên zanista ramyariyê binivîse.

4- Çima civaknasiya ramyariyî ya ku tê bikaranîn, zêde ne pêwîst e?

5- Pergala desthilatdar, dixwaze ramyariyê bi çi awayî bide meşandin?

6- Zagon, ji aliyê kê ve hatiye avakirin û çima?

Wane 3

Civaknasî û Aborî

Aborî, di wateya xwe ya giştî de, kar û xebata debara civakê ye. Her tişt an jî her xebata ku kêrî debara civakê tê, di çarçoveya aboriyê de, pênasekirin gengaz e. Lê di wateya xwe ya berfireh de, aborî peydakirina hemû pêwîstiyên heyberî û karê aboriya civakê ye.

Xebata herî zêde ku civak pê re têkildar dibe, xebata aboriyê ye. Di civakê de, her kesek bi awayekî, bi karê aboriyê re têkildar dibe. Ji ber vê yekê, karê fîzîkî û rewanî yê ku herî zêde bandorê li civakê dike, xebata aboriyê ye. Di civakê de, ew qas girîng e ku kesên weke fîlozof Marks xwestiye civakê li ser hêmana aboriyê pênase bike. Karên ku di warê aboriyê de me pênase kirine, hem ji aliyê civakî ve hem jî ji aliyê derûnnasiyê ve, kes û komên civakî rasterast bandor dike. Ji ber vê yekê, di nava beşên zanista civakî de, ya girîng ew e ku em dikarin bi awayekî berfirehtir civakê bi aboriyê pênase bikin.

Weke gelek qadên jiyanê, qada aboriyê ango hilberînê jî, di pêvajoya kapîtalîzmê de, ji civakê hatiye dizîn û weke cihên rajekirina (xizmetkirin) karmendan hatiye hiştin; ji ber vê yekê,

bi taybetî di nûjentiya kapîtalîst de, di bin navê zanista aboriyê de, teoriya dizîn û qumarê jî tê kirin.

Mînak: Li ser televîzyonan guftûgoyên ku di bin navê aboriyê de tên kirin, hemû jî li ser borsa û bilindbûna dolar, petrol û zêr in. Weke ku em dizanin, borsa jî qumara bizagon e. Pêwîst e borsa weke zanisteke civakî û aborî ji bo civakeke dewlemend, bê pirsgirêkên birçîbûn û bêkariyê bigire dest û bi pêş bixe. Di civaka ku hejar û dewlemend tê de hebin, li wir zanista aboriyê şaş tê bikaranîn.

Tiştê ku di serî de bê kirin, pêwîst e her kes zanibe ku xebatên aboriyê, ne xebatên takekesî (tenayî) ne; lê belê, xebatên civakî ne. Mirovek bi tena serê xwe nikare di nava pêvajoyeke hilberînê de cih bigire.

Encax bi hevbeşiyeke civakî re, dikare di nava çalakiya hilberînê de cih bigire. Di vê wateyê de, hilberîn rasterast diyardeyek e ku komên civakî û çalakiyên wan ên civakî digire nava xwe. Di vî warî de, aborî têkiliyên civakbûnê diyar dike. Ji ber van taybetiyên xwe, aborî jî şaxekî zanista civakî ye.

Civakên ku aboriya xwe bi rêxistin nekiribin, nikarin azad bijîn. Birêxistinkirina aboriyê jî beriya her tiştî, zanabûna civakê ye; ji ber vê yekê, têkiliya wê bi civaknasiyê re heye.

Civaknasî û Erdnîgarî:

Erdnîgarî: Ew zanista ku fîzîka parzemîn û welatan, avhewaya wan, dewlemendiyên li ser û binê erdê, mirov, lawir û şînatiyên li van deveran dijîn, dike mijara lêkolînên xwe.

Her cureyên heyînên ku li ser erdê dijîn, ji erdnîgariyê bandor dibin, civak jî ji mercên erdnîgariyê bandor dibe. Bandorbûna ji erdnîgariyê, tiştekî xwezayî ye. Heta mirov dikare bibêje ku kes jî, ji erdnîgariyê bandor dibe.

Mînak: Civakên ku di avhewaya gerim de dijîn; xwarin, cil û berg û avahiyên wan ji civakên ku di cihên sar de dijîn cuda ne. Ji ber vê sedemê, ji bo ku civaknasî bandora taybetiyên erdnîgariyê yên li ser jiyana civakî tê bigihêje, pêwîst e ji zanista erdnîgariyê sûdê wergire. Bi taybetî, erdnîgariya mirovî di lêkolînên zanistên civakî de, alîkariyeke mezin dide civaknasiyê.

Weke ku em dizanin, civak ji aliyê çandî ve, bi awayekî rasterast û zêde ji erdnîgariyê bandor dibe.

Her civak, bi çanda xwe heye. Heger mirov bixwaze çandekê binase, pêwîst e di serî de erdnîgariya ku ew çand li ser çêbûye, binase. Her civak ne tenê ji aliyê fîzîkî ve, lê belê ji aliyê kesayeta xwe ve jî; ji erdnîgariya xwe bandor bûye.

Her erdnîgarî, hest û ramanên mirov geş dike; ji ber vê yekê jî, weke hest û zanabûneke civakî, welatparêzî jî rasterast bi ax û welat ve girêdayî ye. Ji ber sedemên bi vî awayî, civaknasî dema ku dest bi lêkolîneke dike, yek ji zanistên ku serî lê dide û alîkariyê jê werdigire, erdnîgarî ye. Bi kurtasî, mirov bê ax û av nikare bijî, erdnîgarî û civaknasî jî beyî hev û du nabin.

Pirsên Nirxandinê

1- Aboriyê pênase bike.

2- Qada aboriyê, di pêvajoya kapîtalîzmê de, ji aliyê civakê ve çawa hatiye dîtin?

3- Erdnîgariyê pênase bike.

4- Her erdnîgarî, hest û ramanên mirov geş dike, ev tê çi wateyê?

5- Çima erdnîgarî û civaknasî, ji hev û du cuda nabin?

6- Aboriya derdora te çawa bandor li ser civaka te kiriye? Lêkolîn bike.

Wane 4

Civaknasî û Derûnnasî

Derûnnasî, weke zanistekê di nava zanistên civakî de cih digire. Her çi qas hin derdor derûnnasiyê weke şaxekî zanistê nepejirînin jî, lê ji ber ku kokên nêzîkatiyên mirovan lêkolîn dike, weke zanistekê tê pejirandin.

Em jî dibêjin; pêwîst e derûnnasî weke zanistekê di nava zanistên civakî de cih bigire; Ji ber ku mirov di nava komên civakî de şêwe digire, hin taybetiyan qezenc dike û li gorî vê jî nêzîkatiyan nîşan dide. Ji ber ku nêzîkbûn jî dikevin nava qada derûnnasiyê, ya herî rast ew e ku derûnnasiya civakî jî, di nava zanista civakî de, were pênasekirin.

Derûnnasiya ku îro heye, piranî weke zanista ku nexweşiyên

derûnî çare dike, tê bikaranîn. Ango mirov ji aliyê derûnî ve hebûneke civakî, zêde li ser ranaweste. Ji ber vê yekê, îro pêwîstî bi derûnnasiyeke rast heye. Di hişê mirovahiyê de hêza herî mezin a ku cih digire, xwesteka azadiyê ye. Ji ber vê yekê divê

mirov bi vê zanabûnê, xwe perwerde bike. Ne ku kes, ji civak û dîroka wî cuda bike û weke hebûneke nexweş lê binêre; Ji ber ku di roja me de derûnnasî, bûye weke zanista ku pê pereyan qezenc bikin, ev yek jî şaş e. Ev nêzîkbûn, mirovan weke lawiran digire dest. Em ji bîr nekin ku mirov hebûneke civakî û dîrokî ye; ji ber vê yekê derûniya wan jî bi vê rastiya wan ve girêdayî ye. Heger kes ji aliyê derûnî ve ne baş be, sedema vê nebaşiyê civaknasiya bêmafî ye ya ku di nava civakê de tê jiyankirin. Lê ji ber ku civaknasî, di destpêkê de weke zanist rast nehatiye bicihkirin, derûnnasî jî li ser rastiyê bi pêş neketiye.

Derûnnasiya civakî, şaxekî zanistê ye ku kes di nava komekê de digire dest û bandorbûna kes a bi komê re lêkolîn dike. Her wiha, têkiliyên kes ên bi civak û derdorê re û bandorên civakê yên li ser kesan lêkolîn dike. Kes, di helwest, reftar û baweriyê de, bi çi awayî ji civakê bandor bûye, dike mijara xwe û lêkolîn dike.

Mînak: Zarokên gelê kurd, bandora civakên li Kurdistanê dibînin û ji aliyê erênî û neyînî ve jê bandor dibin. Ev rewş, di kesan de derûniyeke cur bi cur ava dike.

Civaknasî û Mirovnasî (Antropolojî)



Antropolojî weke peyv, tê wateya zanista mirov. Ji peyvên antropoz (mirov) û logos (zanist) çêbûye. Wekhevî û cudahiyên di navbera mirovan de, li ber çavan digire û bi nêrîneke beranberkirina mirovan, lêkolîn dike.

Antropolojî, di nava cîhana zindiyan de cihê mirov, pêvajoyên pêşketinên ku derbas kirine û heta cureyên hemdem ên mirovan û hemû teşeyên mirov, lêkolîn dike. Lê, weke kes, bi mirov re mijûl nabe. Ew li mirovên ku di nava komekê de dijîn û nêzîkatî û tiştên ku ev mirov dikin baldar e. Bi kurtasî, mirovnasî şaxekî zanistê ye ku dîroka mirov a herî kevn û ji wê dîrokê ta roja me ya îro, mirovan lêkolîn dike.

Antropolojî di nava xwe de, dibe sê beş:

1- **Paleantropolojî (Mirovnasiya Xwezayî):**
Beşa herî kevn a antropolojiyê ye. Bi civakên kevn re mijûl dibe.

2- **Antropolojiya Fîzîkî:**

Bi fosîl (hestiyên zindiyan yên pir kevn) ango bi hestiyên serî re mijûl dibe. **Mînak:** Ji teşeya serî û hestiyan re **Neandertal Cro-magnûn, "Homo Erectus"** tê gotin. Dema ku antropolojiya fîzîkî tê gotin, ev tê wateya ku bi pêşketina fîzîkî ya mirov re mijûl dibe.

3- **Antropolojiya Çandî:**
Di nava pêvajoya pêşketinê de, bi pêvajoyên guherîna çandî ya mirovan re, mijûl dibe û lêkolîn dike.

Mijara sereke ya zanistên civakî; mirov û civak e. Mijara antropolojiya çandî jî, mirov û civak e. Antropolojiya çandî, çi dibêje? Dibêje: Mirov dişibin hev, taybetiyên hevpar nîşan didin.

Ya din jî dibêje: Mirov ji hev pir cuda ne, ji ber ku mirov heyîneke çandî ye. Hemû mirov, di nava heman çandê de şêwe nagirin. Civakên mirov ên ku di nava erdnîgariyên cuda de bi cih bûne û jiyane, li gorî xwe bi şêwegirtineke civakî û dîrokî, taybetiyên cuda ji xwe re peyda kirine. Ji ber vê yekê, mirov ji hev cuda ne.

Mirov dişibin hev, ji ber ku xwedîtaybetiyên hevpar ên biyolojîk in. Di bingeh de pirsên ku antropolojî li bersiva wan digerin, ev in.

Antropolojiya çandî jî, ji ber ku bi nêzîkatiyên mirovan re, ango bi nêzîkatiyên çandî yên mirovan re, mijûl dibe, di nava zanistên civakî de cih digire.

Ev zanist, despêkê ji bo ku cudahiyên di navbera mirovên civakên Ewrûpî û mirovên civakên din de rave bike, derketiye.

Mînak: Li gorî gelek derdorên Ewrûpî; efrîkayî û rojhilatî bi civaka xwe paşmayî ne; ji ber ku ne li gorî wan in. Ji ber vê yekê, dema ku mirov antropolojî û zanistên din ên civakî bigire dest, pêwîst e nêrînên şaş ên ku di van zanistan de hatine bipêşxistin jî, zanibe.

Ristem Cûdî, Antropolojiya Ewrûpayê dinirxîne û dibêje: **"Hemû kar, xebat û amadekariyên ku ewrûpiyan ji bo dagirkirina Afrîkayê dikirin, di antropolojiyê de bi paş ket, ji ber nas kirin ku mirov û civak li Afrîkayê heta astekê, bi pêş ketibûn"**

Pirsên Nirxandinê:

1- Çima derûnnasî weke zanistekê di civakê de tê pejirandin?

2- Çima derûnnasî, li ser rastiyê bi pêş neketiye?

3- Derûnnasiya civakî, çi ye? Erka wê diyar bike.

4- Antropolojiyê weke peyv û zanistê pênase bike.

5- Çend beşên antropolojiyê hene? Binivîse.

6- Antropolojiya çandî, pênase bike.

7- Çi cudahî di navbera zanistên civakî û antropolojiya çandî de hene?

8- Çima antropolojiya çandî, di nava zanistên civakî de cih digire?

BEŞA ÇAREM

ÇAND Û CIVAK

- Çand çi ye?
- Civaka sincî û ramyarî.
- Bandorên çandê yên li ser çêbûna civakî û kesayetî.
- Çanda kurdewariyê.

Wane 1

Çand Çi Ye?

Hemû berhem û nirxên daringî û rewanî yên ku civaka mirovahiyê afirandine , ji wan re **"çand"** tê gotin.

Têgeha çandê, weke wateya ku em îro bi kar tînin, cara yekem di sedsala 17'an de ji aliyê fîzolofê Alman Samuel Pufendorf (Samwêl Po-fendorf) ve hatiye bi-karanîn. Li gorî wî, çand; "hemû berhemên mirov ên dijî xweza û di nava têkiliyeke diyar a civakî de derketine holê ye".

Çand nasnameya, civakê pêk tîne. Bi vê nasnameya xwe, ji civakên din cuda dibe. Her wiha awayekî hizirîn û jiyankirina civakê ye. Di jiyana civakê de ziman, raman, sazî, zagon, amûr, teknîk, huner û hwd digire nava xwe. Weke niha jî ku em di zimanê rojane de bi kar tînin. **Çandyar** an jî **xweyîçand,** tê wateya bi zanabûn, têgihiştbûn, aqilbûn û di nava civakê de xwedîpîvanbûnê ye.

Çand, ji du hêmanên sereke pêk tê:

a- Çanda daringî: Hemû berhemên ku di encama çalakiya mirov de pêk hatine, yên weke: wêne, xanî û hemû amûrên ku hatine çêkirin, dikevin beşa çanda daringî.

b- Çanda rewanî: Hemû berhemên ku di encama têkilî û pêwendiyên civakê de derdikevin, ên weke: ziman, bîr û bawerî, zagon, nirx, sinc û kevneşopî, dikevin beşa çanda rewanî.

Di navbera her du hêmanên çandê yên daringî û rewanî de, têkiliyeke weke ya goşt û neynûkê heye. Dema ku yek ji wan

rastî guhartinekê tê, bandorê li ya din jî dike. Çand, bi derdora xwezaya civakê re, di nava mercên guhartinê de ye.

Mînak: Civakên ku li herêmên çiyayî dijîn, çanda wan ji çanda civakên ku li herêmên deştî dijîn, cuda ye.

Taybetiyên çandê yên sereke:

1- **Çand, diyarker e:** Her civak, xwedîçandeke xweser e.

2- **Çand, dîrokî ye:** Ji destpêka mirovahiyê heta roja me, bi civakê re berdewam kiriye.

3- **Çand, berhemeke mirov e:** Mirov çandê çêdike; çand jî kesayet û nasnameyekê ji mirov re ava dike.

4- **Çand, tê guhartin û veguhartin:** Çand, bi demê re tê guhartin. Bi taybetî çanda daringî, leztir tê guhartin û di her civakê de, li gorî taybetiyên xwe ji aliyê guhartinê ve cudahî hene. Dema ku çand, ji nifşê kevn weke berhemekê derbasî nifşê nû dibe, bê guman rastî guhartinan tê.

Li gorî dema îro, çand tê guhartin û dewlemend dibe. Li gorî serdemê, çand bi heyînên pêwîst dewlemend dibe û yên ku ne li gorî serdemê bin, tên derxistin.

Niha jî em dikarin taybetiyên çandê bi awayekî giştî û berfirehtir, rave bikin:

a- **Çand, civakî ye:** Çawa ku mirov ji nifşên beriya xwe fêr bûne û bi awayekî giştî çanda xwe parastine û derbasî nifşê li pey xwe kirine, wiha jî dide fêrkirin. Ji ber vê yekê jî çand, ji bo mirov bermahiyeke civakî ye.

b- **Çand tê fêrkirin:** Çand, bi fêrbûnê tê qezenckirin û bi rêya tevlîbûna mirovan, ji nifşekî derbasî nifşekî din dibe.

c- **Çand tê ragihandin û berdewamkirin:** Çand diyarker e, weke fêrbûnekê lê tê nêrîn û di encamê de bi rêya tevlîbûnê, ji nifşekî ta nifşekî din tê veguhastin. Tevahiya zindiyan, xwedîkêrhatinên fêrbûnê ne. Lê yê ku bi zanebûn zarokên xwe fêr dike, tenê mirov e. Amûra bingehîn a fêrbûnê, ziman e; ji ber ku di nava civakê de hemû berhemên çandî bi rêya nivîskî, devokî, sincî û ramyarî derbasî nifşê li pey xwe dike. Dema ku çand tê gotin, beriya her tiştî mirov, tê bîra mirov; ji ber ku bi domdariya kevneşopiyê pêk tê.

d- **Çand, pêwîstiyeke domdar e:** Çand, xwedîtaybetiyeke domdar a pêwîstiyên cur bi cur e. Çand, pêwîstiyên mirov ên fîzyolojîk û civakî pêk tîne. Heger çand hemû pêwîstiyên mirov ên biyolojîk û civakî bi cih bîne, wê demê di tevahiya çandan de sazî û hêmanên çandê yên hevpar hene.

e- **Di navbera hêmanên çandê de ahengek heye:** Di her çandê de, hêmanên ahengdar û westar (qayîm) ku yekgirtinekê pêk tînin, hene. Di civakê de malbat, huner, jiyana aborî, kevneşopî û nirxên sincî, hev sergihayî dikin û weke çêbûneke giştî derdikeve holê.

f- **Çand, pergaleke rêkûpêkiyê ye:** Çand weke civak, ji pejirandina rêgezên rewanî û ji nêzîkatiyan pêk tê. Di rewşa jiyana civakî ya mirovan de, diyarkirina zagonên

nivîskî û nenivîskî, pêkhateyeke giştî û domdar aniye holê; ji ber ku rêgezan ev pêşketin çêkirine û ji nifşê nû re, ragihandiye. Her wiha mirov bi rêgezên civakî dixebite û encamên bingehîn ên çandî pêk tîne.

g- **Çand giştîbûn (tevahîbûn) e:** Hemû hêmanên ku çandê pêk tînin, taybetiyeke ahengdar û yekgirtî weke pergalekê pêk tînin. Heger çand, pêkhateyeke giştî pêk neyîne, nikare di civakê de, ji aliyê civakî û aborî ve jî, girîngiyekê qezenc bike.

Pirsên Nirxandinê

1- Çandê li gorî xwe pênase bike.

2- Hêmanên sereke yên ku çandê pêk tînin, şîrove bike.

3- Taybetiyên çandê yên sereke, diyar bike.

4- Çima çand civakî ye?

5- Çima amûra bingehîn a fêrbûna çandê, ziman e?

6- Çima di jiyana civakî ya mirovan de diyarkirina zagonên nivîskî û nenivîskî, pêkhateyeke giştî û domdar aniye holê?

Wane 2

Civaka Sincî û Ramyarî

Xwezaya civakê, di bingehê xwe de sincî û ramyarî ye. Mirov nikare bê sinc û ramyariyê bihizire, lê belê dikare civakê neçarî bêsincî û bêramyariyê bike. Dikare kêrhatina sincî û ramyariyê lawaz û qels bike ku nikaribe bi rista xwe rabe, lê tu carî nikare wê tune bike. Tunekirina wê, tenê bi awayekî gengaz e, ew jî heger ji warê civakîbûnê derkeve.

Ji ber ku mirov hebûneke bi hiş û hest e, civak bêgiyan nabe. Mirov bi hiş û hestên xwe wateyê dide afirîneriya xwe. Di civaka mirovan de, sinc û ramyarî di vê xalê de dikevin navberê. Hest û raman dibin sedem ku kes û komên civakê, bibin xwediyên sinc û ramyariyê.

Mînak: Hestên weke: berpirsiyarî, parvekirin, hezkirin, rêzgirtin û hwd di civakê de, xwedîcihên ku herî zêde mirov tê de sincê rasterast dibîne, têkiliya dê û zarokan e. Her wiha di têkiliya hevaltî û dostaniyê de jî, bawerî û germahiya ku di navbera wan de hene, sinc e. Di cîrantî û xizmatiyê de jî, rewaniya ku tê jiyankirin, çavkaniya xwe ji sincê civakê digire. Heke sinc û ramyarî di civakê de nebin, kes kar nake. Ji ber vê yekê, **Abdullah Ocalan** wisa nîşan kiriye **"civak di heman demê de, hebûneke sincî û ramyarî ye"**.

Sinc û ramyariya ku di berjewendiya tevahiya civakê de ne; sinc û ramyariya azadiyê ne; ji ber ku sinc û ramyarî ji nêz ve têkiliya wan a xurt bi azadiyê re heye. Sinc dibe sedem ku mirov ji çend bijarteyan, a herî baş hilbijêre. Ev bijartin dibe karek, di civakê de em ji vî karî re, **"ramyarî"** dibêjin. Dema ku mirov a baş nas bike û pêk bîne, azad dibe; ji ber vê yekê jî ji başiyê re, **"sinc"** û ji kiryarên başkirinê re, **"ramyarî"** tê gotin. Ev her du kiryar, di nava civakê de dibin pêkanîna sincê azad û ramyariya ku civakê azad dike.

Di heman demê de, civaka sincî û ramyarî, civakeke demokratîk e. Demokrasî, dikare tenê li ser bingehê heyîna civaka sincî û ramyarî, wateya civakeke pêşketî û azad bide. Civaka demokratîk a ku kes û kom tê de dibin hîm, civaka sincî û ramyarî herî zêde

bi pêş dixe. Ya rasttir, em ji erkdariya civaka ramyarit re, dibêjin **"demokrasî"**. Ramyarî û demokrasî di wateya rastîn de, du têgehên wek hev in.

Heger azadî qadeke jîngehî be ku ramyarî xwe tê de derbirîne, demokrasî jî di vê qadê de şêwazê pêkhatina ramyariyê ye. Sêmendiya azadî, demokrasî û ramyariyê, nikarin ji bingehê sincî bê par bibin. Her wiha mirov dikare ji sinc re bibêje: Ew awayê kevneşopî ye ku li ser bingehê azadî, demokrasî û ramyariyê saz bûye.

Civakên sincî û ramyarî her tim bi dewletê re, di nava dijberiyê de ne. Dewlet her tim dixwaze zagonê bixe şûna sinc û birêveberiya bîrokratîk jî bixe şûna ramyariyê. Li her du aliyên vê nakokiyê ku di dirêjahiya dîrokê de domîne; rêbaza şaristaniya navendî ya bidewlet û rêbaza şaristaniya nenavendî ya demokratîk bi pêş dikeve. Du rastiyên cuda derdikevn holê. Nakokî, dibe ku yan pir dijwar bibin û rê li ber şer vekin, an bikevin rêya lihevhatinê û rê li ber aştiyê vekin.

Pênasekirina civaka sincî û ramyarî ya bi awayê komînal, koledarî, feodal, kapîtalîst û sosyalîst weke ku hev û du dişopînin, li şûna ku diyar be, rista nixumandinê dilîze. Bêguman di civaka sincî û ramyarî de, cihê teşeyên weke: koledarî, feodal û kapîtalîst tune ye. Ya girîng ew e ku mirov ne wan tune bike û ne jî ji aliyê wan ve were daqurtandin. Lê mirov, qad û hêzên wan, bi bilindbûna civaka sincî û ramyarî her tim sînordar dike. Pergalên komînal û sosyalîst, di rêjeya ku bibin demokratîk de, dikarin bi civaka sincî û ramyarî re bibin yek.

Dahûrandinên Li Ser Civaka Sincî û Ramyarî, Wiha Ne:

"Civaka ku nikaribe cihê rêgeza civaka sincî maf bike û maf bide, berdewamiya wê; ne di avahiya wê ya hundirîn, ne jî di jîngeha wê de namîne. Civakeke ku rêgeza wê ya ramyarî tune be, neyê xebitandin an jî ji holê bê rakirin; ew civak mirî ye û mirov dikare rewşa wê ya herî baş, weke civaka mêtinger şîrove bike û ji ber vê sedemê, damezirîna ku civaka demokratîk dide rêgeza ramyariyê, xwedîgirîngiyeke jiyanî ye".

Zanista civakî ya ku di destê desthilatdar û nûjentiya kapîtalîst de bûye çeka herî metirsîdar, ji bo mirovahiyê bergeh û awayekî pir çewt daye civak, sinc û ramyariyê. Her du şerên cîhanî yên sedsala 20'an û qeyranên aborî, çandî, ramyarî û civakî yên van pêncsed salên dawî, xwe dispêrin vê zanista pozîtîfîst a hişk û bêsinc. Zanist û zanyar, bûne weke tiştên ku tên kirîn û firotin.

Herî zêde jî, di roja me ya îro de nirxên civakî û sincî bêwate bûne. Ezeziya ku pergala kapîtalîst weke derhozeyekê pêşkêşî cîhana hemdem kir, îro sedema herî bingehîn a tunebûna civak, jîngeh û cîhanê ye; ji ber vê yekê tiştê dikare mirovahiyê ji gengeşeya ku jiyana mirov dorpêç dike, bide rizgarkirin, vegereke xurt a li sinc û ramyariyê ye.

Pirsên Nirxandinê:

1- Xwezaya civakê, di bingehê xwe de çawa ye?

2- Gelo çima civaka sincî û ramyarî, civakeke demokratîk e?

3- Dewlet, her tim li şûna sinc û ramyariyê, dixwaze çi bi cih bike û çima?

Wane 3

Bandorên Çandê yên Li Ser Çêbûna Civakî û Kesayetê.

Bandorên Çandê yên Li Ser Çêbûna Civakî:

Weke ku hatiye diyarkirin, çand pêkhateyeke civakî ye. Civak bi çanda xwe dewlemend dibe. Civak bi aliyê xwe yê çandî ve, dikare li hemberî çanda desthilatdaran raweste û li ber xwe bide. Dema ku di çandê de lawazî hat jiyankirin, civak hêdî hêdî ji nirxên xwe dûr ketin û ber bi tunebûnê ve çûn. Çi qas çand bihêz be, ew qas rê li ber pêşketina civakî jî vedike.

Bi guhartina çandê re, civak jî tê guhartin. Çand weke nasnameya civakê tê dîtin û di guhartin û pêşketina civakê de jî, risteke sereke dilîze. Dema ku di nava civakê de, guhartin û veguhartin tên çêkirin, li vir xala herî girîng ew e ku divê mirov temaşeyî raboriya civakê bike ku bandoreke çawa bi guhartin û veguhartinê re li civakê bûye.

Bêguman, di nava her civakê de, guhartinên civakî pêwîst in. Lê divê ev guhartin li gorî bingehê civakê be, her wiha afirandinên civakî yên ku di qonaxeke raboriyê de qezenc kirine, li ber çavan werin girtin, ku di heman demê de bibe sedemên parastin û dewlemendkirina van destkeftiyên civakî; ji ber ku yê guhartinê pêk tîne jî, bandorên çandî ne. Di vê mijarê de pir girîng e ku mirov siberoja civaka xwe ya çandî li ber çavan bigire.

Çand, di encama pêşketina ziman, perwerde û amûrên ragihandinê de bandora xwe li civakê kiriye. Di nava civakekê de mirov bi nasnameya xwe ya çandî, tê naskirin û bandorê dike. Hemû karên mirov ên civakî, bi rêya çandê tên qezenckirin. Rewşa berhemên çandî di nava civakê de çi qas li pêş be, ew civak bi vê rewşa xwe li pêş e. Bi vî awayî berhemên çandî bi rêya perwerdeyê, girîngiya xwe qezenc dike û rê li ber pêşketina civakî, vedike.

Civak, bi çanda perwerdeyê re, li ser hîmê xwe yê bingehîn ku di nava raboriyeke dirêj de hatiye bidestxistin, bi pêş dikeve. Dema ku mirov li aliyê din dinêre, dibîne ku çandên pirreng li cîhanê hene. Heta di nava hin welatan de çend çandên cihêreng hebûna xwe diparêzin.

Bandorên Çandê yên Li Ser Çêbûna Kesayetê

Bi cihwarbûna mirov a li ser xakê ya bi şêweyê gund, çandinî, kedîkirina lawiran, komkirin û bipêşxistina amûrên hilberînê re, çanda jiyanî bi pêş ket. Têkilî û danûstandinên li ser bingehê civakbûnê, du pergal pêk anîn. Pergala yekem: Pêvajoya civaka komînal û demokratîk e. Di vir de civaka wekhev, azad, sincî û hwd bingeh e. Pergala duyem jî: Serdema desthilatdarî û dewletê ye. Bi vê serdemê re êdî di nava dilê xwezaya duyem (civak) de çanda fêlbazî, qurnazî û hişmendiya dewletparêz di nava civakê de hatine bipêşxistin.

Di encamê de çanda mirovahiyê, bi du aliyan ve cuda bûye:

1- Çanda xwedîdîroka herî dirêj, çanda komînal û demokratîk e.
2- Çanda desthilatdar, a dewletparêz e.

Ev di heman demê de nirxên çandî yên ku mirovahiyê afirandine, yên weke: ziman, wêje, huner û hwd ku bi rêxistin kirine, çanda dewletparêz a ku ne pêwîst û ne neçar bû. Di rastiyê

de dîroka civakbûyîna mirovan ji rêya hişmendiyê derketibû. Bi zordarî û qirkirinên ku li ser çanda civakê hatine sepandin, ji aliyê hişmendiya dewletparêz ve her cureyê hewldanan hatiye dayîn û hemû nirxên ku mirovahiyê afirandine, êdî biçûk hatine dîtin, sivik û hov jî hatine pejirandin.

Dema ku mirovan hewl da rastiya çanda xwe ya civakî tê bigihêjin, çanda dewletparêziyê bi darê zorê civak xistin bin fermana xwe. Vê yekê jî pêkhateyeke nû bi xwe re derxist holê. Mirov ketin ser rêya lêgerîna rastiyê; ji ber ku her tiştên li ser navê jiyan û mirovahiyê, biqurnazî û bêwijdanî berovajî kirin. Bi qirkirinên fizîkî û bêmafiyan re, kevir li ser kevir nehiştin û her tişt talan û bindest kirin. Ji aliyekî ve pêvajoya çandbûnê berdewam kir, ji aliyekî ve jî dîroka şer û hizira parastina hebûna çandî derket holê, ji aliyekî din ve jî çanda bajarên dewletparêz dest pê kir.

Ramyariya qirkirina çandî ya gerdûnî, di serdema nûjentiya kapîtalîst de bûye xwedînasname. Di dîrokê de tu carî mirov nedîtibû ku bi qasî serdema nûjentiya kapîtalîst, qirkirina fizîkî û çandî li ser pêk hatiye. Qezenciya herî zêde, pîşesazî û dewletparêziya netewî, bi awayê hegemonîk di sazîkirina

qirkirina çandî re, derbas dibe. Nûjentiya kapîtalîst, tenê li ser hîmên perçiqandina xweza û sincê mirovan, xwe dike hêza cîhanî.

Mirov di vê qonaxê de, ji derdora xwe ya xwezayî, civaka ku di nav de dijî, saziyên ku tê de kar dike û perwerdeyê dibîne û malbata ku tê de serwer dibe, bandor dibe û bi kesayetekê şêwe digire. Mirov dikare çandê weke komkirina nêzîkatiyên endamên komên civakî diyar bike û dema ku koman xwe di nav de dît, li gorî wê çandê şêwe digire.

Ji ber ku şêwegirtina kesayetiyê, şêwegirtina pêkhateya civakî ye, bandorên çandê yên li ser kesayetê pir girîng in. Kesayeta civakê bi rêxistin û bi pergal dike, şêwe dide civakê û civakê bi pêş dixe. Çand; nêrîn û ramanên ku li ser civakê hene, bi pergal dike û ji vê pergalê re, pêkhateya civakî tê gotin.

Kes jî endamekî vê civakê ye û pêwîst e ku xwe di nava nêrîn û ramanên heyî de bibîne. Di vê wateyê de, çand rêkûpêkiyek e, kesayet jî di bin vê pergalê de şêwe digire. Di vir de, çand pêkhateya kesayetê bandor dike.

Pirsên Nirxandinê

1- Dema ku di nava civakê de çand lawaz bibe, ev tê çi wateyê?

2- Dema ku di nava civakê de guhartin û veguhartin tên çêkirin, çi ji mirov tê xwestin ku bike?

3- Çand çawa bûye amûreke bazirganiyê?

4- Çanda jiyanî çawa hatiye bipêşxistin?

5- Di serdema desthilatdarî û dewletê de kîjan çand tê bipêşxistin?

6- Aliyên ku çanda mirovahiyê cuda kirine, diyar bike.

7- Nûjentiya kapîtalîst li ser kîjan hîmî, xwe dike hêza cîhanî û çawa?

Wane 4

Çanda Kurdewariyê

Kurd gelê herî kevnar û xwedîçandeke dewlemend û binirx e; ji ber ku mercên erdnîgariya Kurdistanê bi taybetiyên xwe yên çiyayî, çandinî û lawirvanî, ji demên kevn de li ser pêkhateya çanda kurdî, bandor kiriye.

Ji ber ku civaka kurd, piranî li herêmên çiyayî û li gundan dijiyan, xwedîçandeke xwezayî ye ku xwe dispêre hokar û çandiniyê. Ango ji têgehên çanda bajarvaniyê dûr in û zêdetir nêzî çanda gundîtiyê ne. Mirov dikare bibêje ku gelê xwediyê çanda herî kevnar û dewlemend, kurd in, ew jî ji ber ku bingehê çanda kurdewariyê xwe dispêre dîrokeke herî kevn ku digihîje serdema neolîtîkê.

Civaka kurd, çi qas gundî û koçer bin, ew qas jî ji çanda bajarvaniyê dûr in. Dema ku mirov li çanda kurdan dinêre, niha jî di hin kêliyan de derdikeve holê ku civaka kurd demeke pir dirêj, hem bi awayên nîvkoçerî û hem jî di nîvcihwarbûneke gundîtî de, jiyane. Pêkhateya çanda bajarvaniyê, bi şêweyên desthilatdariya dagirkeran ve, hatiye sazkirin.

Her çi qas çanda kurdan xwedîkokeke kevnar û bingehê çanda çandiniyê ye jî, lê zimanê kurdî ji ber desthilatdariya dagirkeran, tenê di rewşa herêmî de maye û nebûye zimanekî fermî yê nivîs û bikaranînê. Li gel vê rewşê jî çanda kurdan kariye bi rêyên cuda hebûna xwe ya etnîkî, çandî û berhemên xwe yên dîrokî, ji çanda dagirkeriyê heta roja me ya îro biparêze.

Li gorî lêkolînên gelek şûnwarnasan, çanda kurdan li quntarên Toros û Zagrosê, weke şoreşa çanda neolîtîkê dest pê kiriye û bi demê re bûye bingehê çanda Aryen. Tê zanîn ku di salên 6000 ê B.Z de Hûriyan, Neolîtîk sazûman kiriye û bi demê re çanda herî

dewlemend a Til Xelefê pêk anîne. Ji aliyê kokê ve çandên hûrî, mîtanî, gûtî, medî û kasîtî nêzî hev in. Bingehê wan ê çandî, ziman û herêmî, ji gelek aliyan ve weke hev in. Heger îro qala navên cuda cuda yên yekîtiyên hoz û êlan tê kirin, ev tê wê wateyê ku ji heman gelî ne û koka wan yek e.

Civaka kurd, ji yekeyên cihwarbûnê dest pê dike û bi vî awayî bi demê re dibe xwedînasnameyeke dewlemend a çandî. Weke tê zanîn, di dîrokê de çanda çandinî û gundîtiyê, çanda herî kevn û dewlemend e. Di civakên îro de jî kurd di rêjeyeke mezin de bi çanda çandinî û gundîtiyê hebûna xwe diparêzin. Taybetiya herî girîng a vê çandê; bi komên biçûk û di nava hev de bingehê jiyanbûna xwe bi qasî ku têrê bike, xakê bi kar tînin û ji bo jiyan û pêwîstiyên xwe dest bi çandiniyê dikin û bi çandiniyê, debara jiyana xwe dikin.

Bi vî awayî bingehê jiyana niştecihî, di nava civakê de tê avakirin. Ango **"şoreşa çandiniyê ya destpêkê"**, jê re tê gotin. Bi vê pêngavê û bi demê re, komên ku ji aliyê xwînê ve girêdayî hev in, dibin xwedîrêxistineke êlî û li ser nasnameya etnîsîteyê, nasnameyeke nû ya civakî û girîng ava dikin. Çanda gundîtiyê, xwedîtêgeheke jiyana çandinî û rêxistineke êlî ye. Di çanda çandinî û gundîtiyê de, bi hev re alîkar bûn. Parvekirin, jiyankirin, hevbeşkirin û di nava yekîtiyekê de, giyanekî hevbeş bi xwe re tîne. Bi vî awayî, di nava civakê de çandeke ku xwe dispêre têkilî û peywendiyeke xurt, bi pêş dikeve. Di civaka kurd de, di navbara çanda komînal û nûjentiyê de, her çi qas bi sedê salan têkoşîn berdewam kiribe jî, di pergala kapîtalîst de şêweyê komînal derbas kiriye, lê di civaka kurd de, heta niha jî didome û derbas nebûye.

Gelên ku li ser erdnîgariya Mezopotamyaya Jêrîn jiyan e, zû derbasî zayendparêzî û çînîtiyê bûne, lê gelê kurd demeke pir dirêj li ber xwe daye û çanda xwe ya xwecihî parastiye. Sedema vê ya herî diyar ew e ku xaka cihwarbûna kurdan, li cihên kaş, kendal û çiya ye û dijmin nikare bandora xwe li ser bide meşandin. Di nava çanda kurdan de, girêdana xwînê ji hemû civakên din baştir tê dîtin. Bêguman, ne di cudahiya wê de ne û li hemberî civaka çîndar rawestîn heye, ango asta êlî derbas nekirine. Weke ku hatiye diyarkirin, çanda êlî di civaka kurdan

de pir bi hêz e, heta niha jî di têkiliyên civakî de xwe dide der. Ev rewş demeke dirêj berdewam kiriye, lê dema ku êlê li hemberî civaka çîndar, di rewşa herî azadîxwaz de, helwest nîşan da, zayendperestî û desthilatdariya çînî, bi pêş ket.

Her ku diçû, bingehê çêbûna êlê berovajî dibû û hat rewşa hêza sîxurî, xinizî û desthilatdariya çînîtiyê. Çêbûna çandî ya civaka kurdan, taybetiyên xwe yên hevbeş parastine. Dema ku di nava civakê de çand û sincê hevbeş nebin, mirov nikare qala çand û civaka sincî bike. Ji serdema dîrokê ya kevn ve heta niha, kurd xwedîçandeke dewlemend in. Ev yek ji Hûriyan dest pê dike, bi Medan û konfederalên êlên kurdan re, digihin nasnameyeke çandî ya pêşketî. Di nava çanda civaka kurdan de, mirovê kurd xwedîtaybetiyên mêrxasî, comerdî, duristî, bidad, xwezaperest û heta ji aliyê hunerî, zanistî û civakî ve, hemû aliyên çanda mirovahiyê di nava xwe de diparêze.

Di qonaxa pêşketina civakê de jî, bi civakê re xwe nû kiriye, şêwe girtiye û bi pêş ketiye. Ji aliyê hunerî ve stran, dîlan, govend, şêweyên xwarin û vexwarinê, cihwarbûn, amûr, cil û berg û hemû şêweyên çanda civakî di nava xwe de parastine û bi pêş xistine. Mirov dikare çanda kurdan, weke çandeke herî dewlemend û pêşketî ku xwedîtaybetiyên cuda yên civakî ye, pênase bike.

Pirsên Nirxandinê

1- Çima kurd xwedîçandeke dewlemend û binirx in?

2- Çend dewletên herî kevn û dîrokî yên ku ji aliyê kurdan ve hatine avakirin, binivîse.

3- Di serdema navîn de, çand û zimanê farisî, tirkî û erebî bi rêya çi li ser civak û çanda kurdan bandor kiriye?

4- Çima zimanê kurdî, nebûye zimanekî fermî yê nivîs û bikaranînê?

5- Kengî di civaka kurdan de jiyaneke komînal derdikeve holê?

6- Çima gelê kurd, li ser erdnîgariya Mezopotamyayê derbasî zayendperestî û çîndariyê nebûye?

7- Çêbûna êlên kurdan, her ku çûye ketiye kîjan rewşê?

8- Di çanda civaka kurdan de çend taybetiyên mirovên kurd binivîse.

Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

MEH \ HEFTÎ	HEFTIYA YEKEM	HEFTIYA DUYEM	HEFTIYA SÊYEM	HEFTIYA ÇAREM
REZBER			Civaknasî çi ye?	Armanc û Mijarên Civaknasiyê
COTMEH	Pêkhateyên Civakî-1	Pêkhateyên Civakî-2	Pêkhateyên Civakî-3	Girseyên Civakî
MIJDAR	Beşên Civakî	Ibin Xeldûn	Komte	Harriet-Marks
BERFANBAR	Durkheim û Veber	Civaknasiya Pozîtîvîzim	Civaknasiya Azadiyê	Civaknasiya Azadiyê
RÊBENDAN	LÊVEGER	LÊVEGER	BÊHINVEDAN	BÊHINVEDAN
REŞEMEH	Civaknasî û Dîrok	Civaknasî û Dîrok	Civaknasî û Ramyarî	Civaknasî û Zagon
AVDAR	Civaknasî û Aborî	Civaknasî û Erdnîgarî	Civaknasî û Derûnnasî	Çand Çi Ye?
COTAN	Civaka Sincî û Ramyarî	Bandorên Çandê Yên Li Ser Çêbûna Civakî	Bandorên Çandê Yên Li Ser Kesayetê	Çanda Kurdewariyê
GULAN	LÊVEGER	LÊVEGER		